ÇAPA EWROPA
RÛDAW
ROJNAMEYA KURDÊN DIYASPORA

Piştî mirina diya min diranên bavê min ketin!

» 14

Hevaltiya Kurdekê bû bela serê wê

3 »

Hejmar / Nr. 217
26 Îlon / September 2013

Deutschland	1,50	Euro
Österreich	1,50	Euro
Belgium	1,50	Euro
Danmark	15,00	DKK
France	1,50	Euro
Nederland	1,80	Euro
Norway	15	NOK
Schweiz	2,70	CHF
Sverige	21,00	SEK

www.rudaw.eu
info@rudaw.eu

Festîvala Navneteweyî ya Çanda Kurdî 21. car li dar ket

» 8

Dr. Mucahît Bîlîcî:

'Divê Kurd bibin hakimê dewletên lê dijîn'

» 11

www.arsivakurd.org

Hugenotten malovaniya êzdiyan dikin

Li bajarê Bad Karlshafena Almanyayê pêşengehek bi navê “Êzdî – penaberên olî li Almanyayê“ hate vekirin.

Pêşengeha li mûzexaneya Hugenotten (Deutschen Hugenotten-Museum) bi govendên Koma Laleşê ya ji bajarê Celle hate vekirin.

Serokê komela Civaka Hugenotten keşe Dr. Andreas Flick ev demek bû bi nûnerên ciavak êzdî ya li Celle re ji bo vê pêşangehê amadekarî dikirin.

Keşe Flick di axaftina vekirinê de bal kişand li ser zexta olî ya li ser êzdî û protestanên Fransayê yên ji beriya 300 salan û diyar kir ku gellek nêzîktayî di navbera şêweya wê zilma li wan hatiye kirin heye: “Kesên ji van herdu olan gellek caran ji neçarî veşartin ka ji kîjan olê ne. Ji bo bi awayekî azad ola xwe bijîn, dev ji welatê xwe berdan û koçberî Almanyayê bûn.“

Herwiha armanca pêşengehê jî wekî hevtêgihiştin û xweşbîniya di navbera netew û olan de hate nîşandan. Hugenotten ji mezheba protestan ê Fransayê ne û gellek ji wan ji ber zextên olî û mezhebî yên li ser wan reviyabûn Almanyayê.

Pêşangeha “Êzdî – penaberên olî li Almanyayê“ ji 16 tabloyên ku jiyan, ol û dîroka êzdiyên li Almanya û Kurdistanê radixînin ber çavan pêk tê. Ji van tabloyan yek jê ji bo bîranîna nivîskarê alman yê bi nav û deng Karl May yê ku di pirtûka xwe ya bi navê “Li Kurdistana berî“ de gellekî bi qencî behsa êzdiyan kiribû. Hate diyarkirin ku pêşangeh wê heta 31ê cotmehê ji bo serdanê vekirî be.

Şagirtên misilman mecbûr in biçin dersa avjeniyê

Dadgeha Bilind a Îdarî ya Almanyayê biryar da ku şagirtên keç yên misilman mecbûr in beşdarî dersa ketinavê bibin. Lê belê ji ber sedemên olî ew dikarin cilên ketinavê yên girtî werbigrin.

Malbateke ji Maroko ya li bajarê Frankfurtê dijî nedixwast ku keça wan a 11 salî bi şagirtên kurik re beşdarî dersa avjêniyê bibe. Digel hewldanên dibistanê jî, malbatê destûra keça xwe nedabû. Li ser vê yekê jî mamosteyê wê di dawiya salê de nota herî xerab dabû şagirtê.

Ji bo ku ev yek were sererastkirin, malbatê serî li Dadgeha Îdarî ya li Leipzigê da. Lê biryara dadgehê dilê malbatê xweş nekir. Dadgehê di biryara xwe de (BVerwG 6 C 25.12) diyar kir ku şagirt mecbûr in beşdar dersa ketinavê bibin. Lê belê kesên bixwazin, dikarin ji ber hesasiyeta olî cilên ketinavê yên nuxumandî li zarokên xwe bikin.

Derbarê biryarê de wezîra perwerdê ya eyaleta Hessenê ku Frankfurt jî bajerekî di nava vê eyaletê de ye, Nicole Beer kêfxweşiya xwe ji bo biryarê derbirî. Beer diyar kir ku ev biryar wê ji bo mînakên din yên bi vî rengî li Almanyayê rûdidin jî bibe emsal. Wezîra perwerdê herwiha destnîşan kir ku biryara ji bo cilên ketinavê yên laş dihemînin jî hem rê ji bo pêkanîna baweriya olî û hem jî pêkanîna peywira perwerdê vedike.

Polîsên Bremenê dosyaya Mehelmiyan vekirin

Polîsê bajar-eyaleta Bremen a Almanyayê li ser daxwaza Partiya Xiristiyanên Demokrat (CDU) naveroka dosyayên li ser “Kurdên Mehelmî“ eşkere kir.

Li gor daneyên polîs, 2590 Mehelmî li Bremenê dijîn û piraniya wan xizmên hev in. Bi taybetî ciwanên wan bi sedan sûcên krîmînalî pêk anîne. Herwiha tê diyarkirin ku pirraniya wan ji Libnanê hatine Almanyayê û di navê sûcên ew dikin de ji dizî, şantaj û lêdanê bigire, heta bazirganiya maddeyên hişbir jî heye. Derbarê hejmara sûcên hatine kirin jî ev agahdarî tên dayin: Di sala 2011ê de bi giştî 417 Mehelmiyan 404 sûc li Brêmenê pêk anîne. Par jî 404 Mehelmî tevlî 816 sûcan bûne. Ji Mehelmiyên li Bremenê dijîn 924 kes hemwelatiyên Alman in û ev yek pêşiya dersînorkirina kesên beşdarî sûcan jî dibin digire.

Di 16 rûpelên ku polîsê Bremenê li ser daxwaza CDU ji bo senatoya eyaleta Bremenê amade kirine, daneyên îsal û du salên derbasbûyî di nava xwe de dihewîne. Li gor tomarên polîs, îsal jî li Bremenê 215 Mehelmiyan 348 sûc pêk anîne.

Pêşketin hene lê têrê nakin

Polîs diyar dike ku ji van sûcan bi giştî % 33,78 şantaj û tehdît in. Herwiha serê % 21,6 kesên tevlî sûcan bûne jî bazirganiya maddeyên hişbir kirine. Hejmara lêdan û birîndarkirinên ku ew tevlî bûne jî % 19 e.

Xaleke din a balkêş jî ew e ku ji her çar qereqolên polîsên Bremenê sê jê bi krîmîneliya ciwanên mehelmiyan ve mijûl dibin.

Derbarê hewla daxistina sûcan a bi rêbazên cuda jî, Senatorê bajar-eyaleta Bremenê Ulrich Maeurer ku ji partiya SPD ye, diyar kir ku wan navbeynkarekî çandê kiriye di dewrê de û ev navbeynkar bi taybetî bi çareseriya pirsgirêkên malbatên Mehelmiyan ve mijûl dibe. Bi vê yekê jî pêşketinên erênî hatine bidestxistin û hejmara sûcên kesên temenê wan di navbera 7 û 17ê de ye ji sala 2010 heta 2012ê ji 92an daketiye 86an. Derbarê babetê de Wilhelm Hinnersê ji partiya CDU jî destnîşan kir ku hejmara sûcên têne pêkanîn gellekî li ser yên xelkên din ên li deverê ye û ew hêjî ji întegrasyona malbatên xeternek ên Mehelmiyan dûr in.

Rûdaw

Rojnameyeke siyasî û heftane

Xwedî
Rudaw Media GmbH

Sernûser
Ako Mihemed
ako@rudaw.net

Rêvebirê Nivîsînê
Nasredîn Akyol
nesredin@rudaw.net

Dîzayner
Hamdullah Yumlu

Rêveberî û belavkirin
Sabir Yasîn
sabir.yasin@rudaw.net

Şêwirmendê yasayî û aborî
Ayhan Çiftçî

Marketing û reklam
Sabir Yasîn
sabir.yasin@rudaw.net

Navnîşan
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln/Germany

Pêwendî
Telefon: +49 (0) 221-58 87 22 80
Fax: +49 (0) 221-58 87 22 82
info@rudaw.eu
www.rudaw.net / www.rudaw.eu

Belavkirin / Vertrieb:
Axel Springer Vertriebsservice GmbH
Süderstraße 77
20097 Hamburg
www.as-vertriebsservice.de

Rûdaw ji bo nivîsên ku bi nav tên weşandin ne berpirsyar e.

© Hemû maf parastî ne

Zeki Ozmen

Li hejmara kêm ya şêniyên Luksemburgê nenêrin

Têkiliya wê ya bi Kurdekê re bû sedema şopandina îstixbaratê



Li jor Janina Frish û li kêlekê Zubeyde Ersöz

Rêxistina sîxuriyê ya welatê Luksemburgê bi şopandina endama berê ya meclisa bajarê Luksemburgê kete di rojevê de. Sedemê vê şopandinê jî têkiliya endama meclisê ya berê Janine Frish bi rojnamegera kurd Zubeyde Ersoz re ye. Li ser vê yekê hikûmeta Luksemburgê bi lez daxuyanî da û îdia kir ku Janina Frish qet bi awayekî rasterast nebûye armanca şopandina istixbarata wî welatî.

Endama berê ya meclisa bajarê Luksemburgê Janina Frish ya ji partiya déi Lénk (Partiya Çep) bi daxuyaniyeke çapemeniyê diyar kir ku ew heta ji beriya çend mehekî ji ber têkiliya xwe ya bi rojnamevana kurd Zubeyda Ersoz re ji hêla rêxistina sîxurî ya Luxenburgê SRELê ve hatiye şopandin. Di berdewamiya axaftina xwe de wê bal kişand li ser wê yekê ku bi armanca ew çav li dosyaya xwe ya li cem istixbarê bigerîne, wê serî li serdozgeriyê daye. Cîgirê serdozgeriya Luksenburgê Georges Frisch di bersivnameyê de diyar kiriye ku li cem istixbaratê dosyayek li ser navê wê hebû lê belê ew dosya ji beriya demeke kurt hatiye girtin. Wiewens herwiha daye zanîn ku çavdêrî û agahdariyên neqanûnî ji dosyaya navderbasbûyî hatine deranîn. Cîgirê serdozger Georges Frisch berpirsiyarê şanda xebatê ya dosyayên ji hêla istixbaratê ve têne komkirin e. Lijneya kontrolê ya ku ew birêve dibe, hem naveroka dosyayan kontrol dike û hem jî biryarê dide ka dosya dikarin werin dîtin an jî naveroka wan dikare were jêbirin.

Bûyerê gotinên serokwezîr derewand

Rojnamevana kurd Zubeyde Ersoz di sala 2006ê de li Luksenburgê serî li mafê penaberiyê dabû. Ji ber Înterpol li ser daxwaza Tirkiyeyê li Ersoz digeriya, ew hatibû girtin û girtina wê li Luxenburgê bûbû yek ji rojevên sereke. Ji bo dernesînorkirin û serbestberdana wê ji hêla sazî û partiyên cuda yên Luxenburgê ve pêleke çalekiyên piştgiriyê hatibû lidarxistin. Tirkiye ji ber îdiaya ku Ersoz endama PKKê ye fermana girtina wê dabû Înterpolê. Zubeyda Ersoz zêdeyî sê mehan di girtîgehê de mabû girtî û ji bo protestokirina rewşa xwe ketibû di greva birçîbûnê de. Piştî ew bi ling û destên qeydkirî anîbûn dadgehê, ew serbest hatibû berdan.

Ji hêla din ve li ser gotinên Janine Frish, hikûmeta Luxenborgê jî bi daxuyaniyekî diyar kir ku di meseleyê de şaşfêmkirinek heye û ji hêla SRELê ve ti dosya li ser navê Frish nehatine vekirin. Lê belê di dosyaya Zubeyde Ersoz de navê endama berê ya meclisa bajarê Luksemburgê Janina Frish derbas bûye.

Serokwezîrê Luksemburgê Jean-Claude Juncker jî di rojên derbasbûyî de diyar kiribû ku SREL şopandinên siyasî nake. Janina Frish jî ev gotinên serokwezîr bi bîr xist û diyar kir ku girêdana dosyayekî li ser wê berevajî daxuyaniya serokwezîr e.

Sîxûran dengê serokwezîr jî tomar kirbûn

Di vê navberê de lijneyek bi navê Komîteya Welatiyan jî ji lijneya kontrolê ya dosyayên SRELê xwast ku pêşî li jêbirina naveroka dosyayên istixbaratî were girtin. Di daxwaznamê de hate diyarkirin ku pêwist e naveroka hemû dosyayan radestî saziyên bêalî werin kirin û divê kesên li ser navên wan dosya hatine vekirin bikaribin naveroka dosyayên xwe bibînin.

Li Luksemburgê di navbera salên 1984 û 1986ê de gellek avahiyên fermî û binesazî hatibûn teqandin û dû re jî hatibû îdiakirin ku hinek saziyên dewletê bi xwe di bin pişt van bûyeran de ne. Armanca vê yekê jî wekî daxwaza xurtkirina polîs û artêşê hatibû nîşandan. Pişre jî diyar bûbû ku serokwezîr jî di nav de, gellek kes ji ber vê bûyerê beyî bingeheke yasayî ji hêla rêxistina sîxurî SRELê ve derbarê bûyerê de hatine guhdarîkirin. Ev yek jî bûbû sedem ku gellek kes bixwazin bizanibin ka dosya ji hêla rêxistina Luksemburgê ya sîxuriyê de li ser wan hatine vekirin. Endama berê ya meclisa bajarê Luksemburgê Janina Frish ya ji partiya déi Lénk jî li ser vê yekê serî li lijneya kontrola dosyayên ku ji hêla SRELê ve hatibûn vekirin dabû.

Swîsre wê derbarê penaberên ji Sûrî lezê bike

Piştî hefteyên derbasbûyî ji bo biryardayîna bi lez ya li ser rewşa penebarên ji Sûrî yên li Swîsre, Daîreya Karûbarê Koçberan ya Swîsre (BFM) sozên nû dan.

Gellek penaberên ji Sûrî ev bi salan e li Swîsre serî li mafê penaberiyê dane lê heta niha derbarê rewşa wan de biryar nehatiye dayin. Ev yek jî dibe sedem ku ew nizanibin ka wê rewşa wan a siberojê ya li Swîsreyê bi çi şêweyî berdewam bike.

Li ser çalekiyên pêk hatin, Daîreya Karûbarê Koçberan ya Swîsre diyar kir ku ew ê heta serê salê biryarê derbarê hemû penaberên ji Sûrî yên heta dawiya sala 2009ê serî li penaberiyê dane bidin. Derbarê rewşa penaberên ku piştî 2009ê hatine Swîsreyê jî çav li rê ye ku BFM di demeke kurt de biryarê bide ka wê bi çi şêweyî ligel wan tevbigere.

Daîreyên Swîsre derbarê serîlêdanên penaberiyê zû biryarê dide ka wê wan paşde rêkê welatê ku jê hatine yan jî mafê penaberiyê bide wan. Lê ji dema şerê li Sûrî destpêkiriye, ji hêlekî ve penarên ji Sûrî paş de nayên rêkirin û ji hêla din ve biryar derbarê serîlêdana wan de nayê dayin.

Penaber dikarin vîzeyê ji xizmên xwe re bistînin

Ji hêla din ve wezîra dadê yê Swîsre, Simonetta Sommaruga di rojên derbasbûyî de diyar kiribû ku kesên ji Sûrî yên li Swîsre dijîn, dikarin vîzeyê ji bo mirovên xwe wergirin. Lê belê kesên bixwazin bi vê yekê rabin, pêwist e statûya wan a penaberiyê hatibe qebûlkirin. Herwiha divê ew lêçûna bilêta balefirê, bîm û xanî jî li ser xwe bigirin. Kesên bi vê rêyê werin wê bikaribin 3 mehan bi vîzeya xwe li Swîsre bijîn. Ew dikarin piştî vê demê jî serî li mafê penaberiyê bidin.

Li Swîsre derdora 6 hezar kesên ji Sûrî dijîn û ji van zêdeyî 1600 kesî mafê penaberiyê standiye. Swîsre li ser daxwaza UNCHRê di sala 2012ê de jî 70 penaberên ji Sûriyê yên ji nava şer reviyabûn wergirtibûn û biryar dabû ku di sê salên pêşde jî 500 penaberan bi heman şêweyî bide anîn.

www.arsivakurd.org

Hevkêşeyên Parlamentoya Kurdistanê guherîn

PDK yekem, Goran duyem, YNK sêyem e

Li Başûrê Kurdistanê 4. hilbijartinên parlamentoya Kurdistanê di roja şemiya 21ê Îlonê de pêk hatin. Li gorî encamên nefermî yên hilbijartinê ku heta dema çapê gihiştin ber destê Rûdawê, Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) bi rêjeya % 36.9ê dengan partiya yekem e. Herwiha Tevgera Goran bi % 23.2 yê dengan kete pêşiya duyemîn ya li parlamentoya Kurdistanê û cihê Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) stand. Şirîka hikûmeta Herêma Kurdistanê heta niha 16.8ê dengan wergirtiye. Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê û Komela Îslamî ya Kurdistanê (Komel) jî hejmareke berbiçav ya dengan wergirtin.

Di hilbijartinan de bi giştî 1129 namzed ji bo bidestxistina 111 kursiyên parlamentoyê têkoşiyan. Ji 2 milyon û 839.012 hilbijêrên li parêzgehên Silêmanî, Hewlêr û Duhokê yên Herêma Kurdistanê bi giştî rêjeya hilbijartinê % 73.3 bû.

Li hêla din Komîsyona Bilind a Hilbijartinan ragihand ku encamên hilbijartinên parlamentoya Kurdistanê vê hefteyê nayên eşkerekirin. Serokê komîsyona hilbijartinan Serbest Amêdî ji Rûdawê re ragihand ku encamên hilbijartinên parlamentoya Kurdistanê wê hefteya bê werin eşkerekirin. Biryar bû roja 26ê Îlona 2013ê encamên hilbijartinan bên ragihandin. Serbest Amêdî derheqê sedema derenketina encamên hilbijartinan de tiştek negot.









www.arsivakurd.org

Doç. Dr. Abdullah Kiran

Osman Ozçelîk

Tevî hemû astengiyan jî hêviya çareseriyê xurt e

Lûtfî Baksî

Mehmet Mîr Dengîr Firat

Tirk û Kurd êdî şer naxwazin

Salihê Kevirbirî *Koln*

Hefteya derbasbûyî şanda BDPê li girava Îmraliyê serdana Abdullah Ocalan kir û piştî serdanê daxuyaniyek da çapemeniyê. Şandê eşkere kir ku Ocalan gotiye wan salek berê pêvajoya diyalogê daye destpêkirin û êdî divê pêvajo veguhêze formateke nû.

Li hêla din serokwezîrê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan eşkerekirina paketa demokratîkbûnê careke din taloq kir. Erdoganê ku diviyabû 2 hefte berê paketa xwe eşkere bike, roja sêşemê jî biryara xwe bi paş xist. Serokwezîrê tirk cara dawî eşkere kir ku ewê heta serê mehê naveroka pakête bi daxuyaniyeke taybet eşkere bike.

Herçiqas derbarê naverokê de ji hikûmetê tu daxuyanî nehatibin dayîn jî, çapemenî û medyaya tirk behsa hinek detayên pakete dike. Li gorî ragihandina çapemeniyê, di pakête de navê deverên ku piştre hatine guhertin, careke din li wan têne vegerandin. Li gorî pakête, navê Tuncelî careke din dibe Dêrsim. Her wiha çav li rê ye ku cezayê sûcên nefretê bê zêdekirin, dibistana Rûhbanê ya Heybelîadayê bê vekirin, statuya cemxaneyên elewiyan bê zêdekirin û cemxane wek îbadetxane werin naskirin. Hê ne diyar e bê paketa demokratîkbûnê, rê li ber berdana girtiyên KCK-ê berde yan na.

Di gur û geşiya nîqaşên derbarê pêvajoya demokratîk, rawestandina vekişîna hêzên çekdar ên PKKê û paketa demokratîkbûnê ya ku Erdogan serê mehê eşkere dike de, Endamê Meclîsa Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Osman Ozçelîk, Serokê KADEPê Lûtfî Baksî, yek ji Avakarên AKPê Dengîr Mîr Mehmet Firat û Hîndekarê Zanîngeha Alparslanê ya li Mûşê Doç. Dr. Abdullah Kiran bîr û boçûnên xwe bo Rûdawê eşkere kirin.

Endamê Meclîsa Kongreya Civaka Demokratîk KCDê Osman Ozçelîk, diyar dike ku pêvajo li gorî dilê gelê kurd nameşe, tiştê ku ew ji aştî û çareseriyê fêhm dikin û tiştê ku hikûmeta AKPê fêhm dike ji hev cuda ne: "Li gorî AKPê, şer sekiniye, lewre jî aştî çêbûye. Sekinandina vekişîna derveyî sînoran, dibe ku bandora xwe li xemsariya AKPê bike." Ozçelîk dibêje hikûmet dixwaze çend gavan biavêje lê dema vê yekê dike gavekê bi pêş ve diavêje, sê gavan bi paş diavêje û lê zede dike: "Dixwazin van rojan paketekê eşkere bikin. Lê tu kes nizane di pakêta wan de çi heye. Naveroka pakêtê heta niha jî nehatiye eşkerekirin. Tayyîp Erdogan wekî dîktatoran tevdigere. Ne meclis, ne dezgehên AKPê, bêyî wî nikarin tu biryarê bistînin. Herkes li benda gotina devê Erdogan e. Mîna padîşahekî tevdigere. Mizgeftekê li Taksîmê çêdikin, biryara kulek û pencereya mizgeftê jî Erdogan dide. Li ser navê mîmaran diaxive, li ser navê rojnamegeran diaxive, li ser navê sportvanan diaxive."

Li gorî hizra Ozçelîk, tiştê ku Hikûmeta Erdogan dike ji neçarî dike lê demokrasî bi paket û bazarkirinê nabe. Lewre jî idyar dike ku tu hêviya wan ji AKPê tuneye. Endamê Meclîsa KCDê navnîşana hêviyên xwe wiha eşkere dike: "Di warê çareseriyê de hêviya me bixwe heye. Emê bixwe mafên gelê xwe bi dest bixin. Baweriya me bi gelê me, sazî û dezgehên me û bi serokatiya me û birêz Ocalan heye."

Pêvajo ne xitimiye, hêvî pir in

Hîndekarê Zanîngeha Alparslanê ya li Mûşê Doç. Dr. Abdullah Kiran eşkere dike ku pêvajo bi tevahî nexitimiye, her du alî jî li gorî hevkêşeyan tevdigerin û divê mirov reşbîn nebe: "Pêvajo ber bi başiyê ve diçe. Vê gavê ne Kurd, ne jî Tirk xwedî alternatîfeke din in. Lê problem ew e ku her du alî jî ji hev bawer nakin. Divê dezgehek çêbe ku vê pêvajoyê bişopîne û raya giştî agahdar bike. Hewce nake ev dezgeh, dezgeheke navneteweyî be. Neteweyî be jî dibe. Bo nimûne Komeleya Mafên Mirovan, Mazlûm-Der dikarin bikevin bin vî barî. Raya giştî ya Kurd nema şer û pevçûnê dixwaze. Lê ev nayê wê wateyê ku mafên xwe yên neteweyî û demokratik naxwazin."

Li gorî Kiran sekinandina vekişîna hêzên çekdar wê bandoreke neyînî li pêvajoyê neke. Armanca sekinandina vekişîna hêzên PKKê wekî îşaret û hişyariyekê bi nav dike: "Bi vê îşaretê PKK ji hikûmeta AKPê re dibêje; 'Karê te daye pêşiya xwe bike.'

Abdullah Kiran dibêje şerê çekdarî nema dikeve rojevê û di vî warî de hikûmet jî bi aqilane tevdigere: Hikûmet nabêje; 'we vekişîna çekdarên xwe da sekinandin, naxwe ez jî pêvajoyê didim sekinandin.' Li gorî Kiran pêvajo berdewam dike, ev geşedaneke baş e û meseleya çareseriya Kurd, bi demokratîkbûna Tirkiyê ve girêdahî ye.

Li ser paketa demokratik jî Kiran diyar dike ku ew ne li benda surprîzên mezin e, lê wê hinek gavên baş û erênî tê de hebin. Ew di warekî de jî xemsar e: "Texmîn nakim vê gavê rê li ber berdana KCKyiyan vekin. Lê di pêvajoyeke pêştir de dibe ku di vî warî de jî hin gav bêne avêtin. Ji bo pêkanîna demokrasiye wext lazim e."

Doç. Dr. Kiran di warê veguherîna civaka Tirk de geşbîn e û di vî warî de wiha dibêje: "Civaka tirk ne wekî berê ye. Ew jî guheriye û hêjî diguhere. Hikûmeta tirk hewl dide ku civaka tirk derbarê vê meselê de biguherîne da ku nema wekî berê bifikire.

Herçî Serokê Giştî Yê KADEPê Lûtfî Baksî yê dibêje ku di pakêta Erdogan de tiştek tuneye, hêviya wan zêde ji proseya çareseriya demokratik tuneye, hikûmetê heta niha tu gav neavêtiye û hêviyeke berbiçav nedaye wan. Ji bo peydabûna hêviyê, Baksî diyar dike ku divê ev xal heta niha biketana pratîkê: "Divê heta niha girtiyên KCKê bihatana berdan û perwerdehiya zimanê kurdî bihata destpêkirin."

Baksî bi riya Rûdawê eşkere kir ku ew vê gavê paketeke alternatif amade dikin û ewê di rojên pêş de paketê pêşkêşî meclis û hikûmetê bikin. Di paketa KADEPê de çar xalên sereke hene: 1- Statuya gelê kurd divê bê mîsogerkirin. 2- Zimanê kurdî divê bibe zimanê fermî. 3- Divê benden li ber perwerdehiya kurdî benê rakirin. 4- Bi navê Kurd û Kurdistanê divê sazî, dezgeh û partî benê avakirin.

Lûtfî Baksî her wiha dibêje jinûveavakirina gundan, rakirina sîstema cerdevaniyê û eşkerekirina gorên serok û lîderên Kurdan jî di rojeva partiya wan de ne.

Yek ji Avakarên AKPê Mehmet Mîr Dengîr Firat li ser rawestandina vekişîna hêzên PKKê diyar dike ku vekişîna hêzên PKKê wê bandora xwe li pêvajoyê bike, lê ev bandor nabe sedem ku pêvajo raweste an bixitime. Li gorî Firat, îhtîmala herî xerab ew e ku hevdîtinên bi PKKê re benê sekinandin. Lê dibêje di rewşeke wiha de jî, wê hewldanên demokrasiye ranewestin.

Dengîr Firat derbarê pakêta demokratîkbûnê de bi endaze tevdigere, lê ne bawer e ku careke din şerekî çekdarî destpê bike: "Em nizanin di pakête de çi heye. Lê bawer im tiştên pirr baş û demokratik tê de hene. Hêvî û daxwazên gel ji pakête hene. Ez bixwe jî hêvîdar im. Lê divê em li benda her tiştî jî nebin. Şert û şirût carcaran dikin ku tevahiya daxwazan pêk neyên.



www.avestakurd.org

Hevseroka Partiya Keskan:

Erdogan şirîkê siyaseta binpêkirina mafên kurdan e

Li Almanyayê hefteya derbasbûyî hilbijartinên giştî pêk hatin. Partiya Keskan (Die Grunen) di encama hilbijartinan de % 8,4ê dengan bidest xist û bi vî awayî bû hêza çaremîn ya di parlamentoya Almanyayê de. Em bi Claudia Roth a ku hevseroka partiya Keskan e li ser siyaseta partiya wê ya li ser koçberên li Almanyayê û kêşeyên li Rojhilata Navîn axivîn.

Rûdaw: Cudahiyên bingehîn yên navbera partiya Keskan û partîyên din de çi ne?

Claudia Roth: Em ji hilbijartinan wêdetir difikirin. Ji bo me tiştê herî girîng berdewamîbûna biryaran e. Em ji bo gel, ji bo hawîrdor û ji bo siberojeke baştirîn siyasetê dikin. Em demokrasiya bingehîn dixwazin. Wekî mînak, endamên me hem derbarê namzetên me de û hem jî derheqê babetên bingehîn de biryarê didin. Ji bo nifşên siberojê bikaribin bi dilê xwe bijîn, divê em îro hin tiştan biguherin. Em dixwazin civakeke wekhev, edaletperwer û modern ya ku di nav de cudahiya navbera xizan û dewlemendan kêmtir be pêk bînin. Divê derfetên perwerdeya zarokan ne girêdayî kokên dê û bavên wan bin. Em hewl didin ku heta sala 2030ê, % 100 enejiya ku dikare were nûkirin were bikaranîn. Armancên bi vî rengî yên partiyên din nînin.

Li Almanyayê pirsgirêkên herî girîng niha çi ne?

Gava mirov niha wisa dinêre, rewşa aborî baş xuya dike. Lê dema ev yek li ser bingeha xerakirina siruştê be, rewşa baş ya aboriyê nikare berdewam bike. Li Almanyayê 2,5 milyon zarok û ciwan di rewşa hejariyê de dijîn. Cudahiya navbera dewlemendan, xwediyên milk û belengazan her diçe berfirehtir dibe. Ji pênc kesan yek jê bi mûçeyekî pirr kêm dixebite. Herwiha 6,8 milyon mirov destheqa saetê kêmî 8,50 € distinîn. Ji bo ku siberoja Almanyayê bi vî rengî bimîne, divê di zûtirîn dem de di warê perwerdê û binesaziyê de xebatên girîng werin kirin.

Nasandina mafên kêmenetewan û huquqî ya pirsgirêka kurd ji bo polîtîkayeke demokratîk nîşanên bingehîn in.

Siyaseta we ya derbarê koçberiyê de çi ye? Li gor dîtina we pirsgirekên herî girîng yên koçberan çi ne?

Integrasyona koçberan babeteke me ya girîng e. Em dixwazin polîtîkaya integrasyonê bi polîtîkayeke beşdarbûnê ve temam bikin. Êdî divê koçber xwe hemwelatî bibînin û beşdarî hertiştên vê civakê bibin. Ew ne li derveyî civaka me ne, ew ji her hêlî ve di nav civakê de ne û parçeyekî vê civakê ne. Pêdiviya wan bi wekheviya derfetan ya di warê perwerde û kar de heye. Ji ber vê yekê em dixwazin di baxçê zarokan de kursên integrasyonê û hînkirina zimên baştir bikin. Kursên almanî ji bo herkesî bidin vekirin, pirrzimaniyê wekî şansekî bikarbînin û dîplomayên biyanî bi awayekî hesanîtir werin naskirin. Em dixwazin hemû mirovên ku li vira dijîn beşdarî civakê bibin. Ji ber wê em dixwazin koçber zûtir û hesanîtir bikaribin hemwelatîbûna Almanyayê werbigirin. Hatina kesên bi hevre zewicî ya Almanyayê û pêre jî kursên zimên yên bi vê minasebetê li derveyî welêt têne mecbûrîkirin, divê werin rakirin. Em dixwazin hemû koçber bikaribin li Almanyayê di daîreyên dewletê de wek karmend bixebitin.

Hûn siyaseta Tirkiyeyê ya li dijî Kurdan çawa dinirxînin?

Dînamîzma reformîst ya hikûmata Erdogan ya destpêkê ya guherandina Tirkiyeya kevin, paşvakişîna leşkeran ya baregehên xwe, bi xwe re bêhtir demokrasî û azadî anîn. Me piştgiriya wê siyasetê kir û me bi rexneyên xwe anî zimên ku divê Tirkiye rêya xwe heta bicihanîna pîvanên Kopenhagenê bidomîne. Nasandina mafên kêmenetewan û çareserkirina demokratîk û huquqî ya pirsgirêka kurd ji bo polîtîkayeke demokratîk nîşanên bingehîn in. Hewldanên ku heta îro hatine pêkanîn ne bes in. Ji bo endambûna YE divê pîvanên Kopenhagenê werin bicihanîn û mafên kurdan û yên kêmenetewan werin misogerkirin. Niha bi hezaran çalakvan, rojnamevan, serokên şaredariyan û ciwan li girtigêhan de ne û li Kurdistanê her tim mafên mirovan tên binpêkirin. Em hikûmeta Erdogan rexne dikin, ji ber Erdogan bi awayekî aktîf şirîkê vê siyasetê ye.

Niha li Rojhilata Navîn û bi taybetî li Surî şerê navxweyî didome. Almanya jî dewleteke mezin e û di her pirsgirêkên dinyayê de rola wê heye. Hûn bi taybetî ji bo çareserkirina pirsa Surî çi pêşniyar dikin?

Em dixwazin krîza Surî bi rêyên dîplomatîk were çareserkirin. Peymana navbera Amerîka û Rusya ya ji bo kontrolkirin û tinekirina çekên kîmyewî gaveke baş e. Divê rejîma Esad daxwazên Amerîka û Rusyayê bîne cih û baweriyê bide ku rejîm ji bo danûstandinan amade ye. Pêwiste di encama danûstandinan de komîteyeke ewlehiyê were sazkirin û di zûtirîn dem de çekên kîmyewî yên Surî werin tinekirin. Herwiha di heman warî de pêwist e lijneyeke Yekîtîya Ewropayê were avakirin û ew lijne xwediyê derfetên teknîkî û darayî be. Em dixwazin Almanya jî bi awayekî çalak di nava vê lijneyê de cih bigire.

Hûn biçekkirina hêzên opozîsyonê çawa dinirxînin?

Em wekî prensîb li dijî çekşandina ji bo heremên ku şer li wan heye. Rêkirina çekan herêmê zêdetir destabîlîze dike û şerê navxweyî gurtir dike. Herwiha rêkirina çekan ji bo çareseriyeke aştiyane dibe asteng.

Derbarê êrişeke çekdarî ya navnetewî li dijî Surîyê ramana we çiye?

Em ji bo çareserkirina siyasî ya krîza Surî hewldanan dikin. Ji bo wê jî divê xebatên dîplomatîk werin meşandin. Êrişkirineke Sûrî ya beyî biryara Yekîtiya Neteweyan (YN) li gor yasayên navnetewî ne meşrû ye. Em vê yekê red dikin. Pêwist e endamên girîng yên lijneya ewlekariyê ya YN bi hev re ji bo agirbestê li rêyekî bigerin û konferanseke navnetewî ya aştiyê pêk bînin.

Hevpeyvîn: Seyîdxan Kûrij

Rojeva Ewropiyan

Ahmet Dere

Piştî mehên havînê li Ewropayê hêdî hêdî jiyana aktîf dest pê dike. Dibistan vebûn, hemû saziyên fermî dixebitin û di hemû qadan de kar dest pê kiriye. Bi vê rewşê ve girêdayî hêdî hêdî rojeva siyasî jî zelal dibe û qada niqaşan gurtir dibe.

Çendî mehên havînê di bin siya germahiyê de derbas bûbin jî rojeva Ewropiyan wuqasa hênik nebû. Mijara Sûriyê ji aliyê saziyên berpirsyar yên Yekîtiya Ewropayê ve rojane hate guftûgokirin. Bi taybetî Fransa û Brîtanya di vî warî de pirr aktîf bûn. Civîna G20 ku li Rûsyayê pêkhat, pozisyona giştî ya Ewropiyan jî zelal kir. Ji heman demê bi şûn de mirov dikare nêzîkatiya giştî ya welatên Ewropî hinekê fêm bike. Bi heman rewşê ve girêdayî Fransa jî di zimanê siyaseta xwe de guhertinan çê kir û hêjî çê dike. Mijara şerê li dijî Sûriyê di rojeva Ewropiyan de ketiye rêza duyem.

Hilbijartinên ku di roja yekşema borî de li Almanyayê pêkhatin ji bo Ewropiyan encamekê surprîz neafirand. Li gorî ku min şopand, encama ku partiya CDU bidest xist ji aliyê siyasetmedarên Ewropî ve dihate hêvîkirin. Di nava siyaseta Yekîtiya Ewropayê de cihê Angela Merkel zêde neguherî, wê pozisyona xwe parast, dibe ku hinekê jî xurttir kir. Di salên pêş de Almanya di siyaseta YEyê de xwedî soza herî bilind e.

Ji van rojan de saziyên YEyê bi taybetî parlamen û konsey dest bi pêvajoya xebatê kirine. Li Brûkselê Komisyonên Parlamena Ewropayê civînan çêdikin û di hefteya duyemîn ya Cotmehê de ewên li Strasbourgê civata xwe ya giştî pêkbînin. Wisa diyar e ku di heman civata giştî de wê rojev pirr tije be. Li gorî ku ez dibînim heya wê demê wê siyaseta Ewropiyan ya derbarê Sûriyê de zelal bibe.

Di meha Gulan a 2014ê de hilbijartinên parlamena Ewropayê pêk tên. Ji niha ve partiyên siyasî ên cur be cur welatan amadekariyên xwe dikin. Bi awayekê aşkere ne be jî, di korîdorên saziyên YEyê de pilan û projeyên derbarê heman hilbijartinan de çê dibin. Lewre ji niha û heya dawiya salê divê pirraniya projeyên ku pêwîst e bên zelalkirin wê bên nîqaşkirin. Ji ber ku ji destpêka sala 2014ê bi şûn de pêvajoya hilbijartinan bandorê li ser xebata hemû siyasetmedarên YEyê dike.

Weke tê zanîn, digel hebûna nêzî du mîlyon Kurdên ku li Ewropayê dijîn, heya naha di nava saziyên YEyê de xebateke bi bandor ya Kurdan çênebûye. Hêjî saziya YEyê hin rêxistinên kurd weke « terorîst » dibîne. Lewra pirr pêwîst e ku diyaspora kurd derbarê hilbijartinên parlamena Ewropayê de bibe xwedî helwesteke bi bandor û bikaribe encamekê bigire. Di demên pêş de ez ê bi dorfirehî li ser vê mijarê rawestim.

www.arsivakurd.org

Têsa Manwêlo *Parîs*

Enstîtuya kurdî ya Parîsê şerê manê dike

Piştî derbeya leşkerî ya sala 1980 ya li Tirkiyeyê û pê re jî dema şerê Iraq û Îranê gellek rewşenbîrên kurd koçberî Ewropayê bûn. Enstîtuya kurdî ya Parîsê ji bo wan dibû penagehek.

Ev sazî yek ji kevintirîn dezgehên kurdî yên li Ewropayê ye û gellek xebatên li ser ziman, dîrok û çanda kurdî lê hatine meşandin. Karekî din ê berbiçav yê vê dezgehê komkirina çalakvanên kurd û ewropî ya bi armanca bandorkirina li ser karbidest û raya giştî ya navnetewî ye.

Ji hêla din ve Enstîtuya kurdî ya Parîsê gellek alîkarî bi hunermendên kurd re jî kiriye. Yek ji van hunermendan jî sînemakarê kurd Yilmaz Guney bû ku xelata Cannes a sala 1982ê wergirtibû.

Li gor agahdariyên serokê Enstîtuya kurdî ya Parîsê Kendal Nezan, wan heta niha bursa xwendina 300 xwendekarî li ser xwe girtine. Hinek ji van bûne mamosteyên zanîngehê û hinek jî bûne endazyar. Ji hêla din ve sedî 40ê bûrsê ji bo jinan tê dayin.

Bi hatina François Mitterrand xebat berfirehti bûn

Enstîtuya kurdî ya Parîsê destpêkê wekî komeleyeke rewşenbîrî ya ronakbîrên kurd û fransî ku bi armanca li ser meseleya kurdî bixebite kar kir. Piştî destpêka salên 1980yî xebatên wê geştir bûn û bi hatina desthilatê ya serokê Fransayê, François Mitterrand xebatên çandî berfirehtir bûn.

Bi serpereştiya Enstîtuya kurdî ya Parîsê di salên derbasbûyî de kanala televizyonê ya bi navê Kurd 1 jî hate vekirin lê belê ji ber sedemên aborî ev kanal dawiya sala derbasbûyî hate girtin. Weşandina kovareke demsalî ya li ser zimên ya perîyodîk hêjî ji hêla vê saziyê ve dewam dike.

Di warê arşîvkirina berhemên kurdî û yên derbarê Kurdan de jî Enstîtuya kurdî ya Parîsê çalak e. Pirtûkxaneya wê wekî ya herî berfireh ya kurdî ya li Ewropayê tê destnîşankirin. Di nava vê arşîvê de ji kovar, rojname û wêneyan bigire, heta vîdeoyan jî hene. Taybetiyeke din ya arşîva wê jî parastina 6500 monograf ango nameyên li gor babetan hatine diyarkirin in.

Heman enstîtuyê malovaniya pêşengehên hunermendan jî kiriye. Kendal Nezan diyar dike ku di sala 1993ê de wan li dijî jenosîda li ser kurdan pêşengehek amade kir û wezîrê rewşenbîrî yê hikûmeta herêma Kurdistanê û serokê wê demê yê Fransayê jî li pêşengehê beşdariya vê çalekiya hunerî kirin.

Kampanyayên bi bandor birêve birin

Nezan derbarê yekem konferansa navnetewî ya kurdî ku di sala 1989ê de ji hêla wan ve hatibû amadekirin vê agahdariyê dide: "Sernavê wê ´nasnameya kurd û mirov´ bû. Ji 32 welatan 240 kesayetî û 85 rojnamevanan beşdarî kirin."

Derbarê kampanyayeke Enstîtuya kurdî ya Parîsê ku deng vedabû ,Kendal Nezan vê bîranînê parve dike: "Mezintirîn kampanyaya me di dema koça xelkên Kurdistanê de bû. Vê kampanyayê karî bi awayekî serketî nêrîna kolana fransi bilivîne. Ne tenê kolana fransî, ji bo ku piştgiriya pêkanîna navçeyeke dijfirînê li Herêma Kurdistanê pêk were, bandor li hemû cîhanê kir."

Piştî pêkhatina hikûmeta Herêma Kurdistanê, Enstîtuya kurdî ya Parîsê piştgiriya xwe berdewam kir. Xebatên wê yên derbarê kêşeya kurdî ya li Tirkiye û Sûriyê hêjî berdewam dikin.

Enstîtuya kurdî ya Parîsê ji aliyê 20 kesên xwebexş ve bi alîkariya hejmareke sponser û dostên wê ve birêve diçe.

Digel alîkariya rêxistinên Fransî, Ewropî û hikûmeta Herêma Kurdistanê, Kendal Nezan diyar dike ku kêşeya wan ya darayî kêşeyeke ber bi çav e û ji bo berdewamiya xebatê wan gellek hewl daye. Di dawiyê de jî bi bîr dixe ku şerê wan, şerê manê ye.

WWW

www.rudaw.eu

Her roj, 24 saetan mijar û hejmarên berê yên Çapa Ewropa ya Rûdawê bixwîne.

Bitikîn!

Abonetiya Rûdaw

Ez dixwazim bo dema
☐ şeş mehan ☐ salekê ☐ vekirî
bibim aboneyê/ya rojnameya Rûdaw.

Rojnameya min heftane bişînin vê navnîşanê

Nav :
Paşnav :
Navnîşan :

Telefon a min :
E-Mail a min :

Buhayê abonetiyê ji vê kontoyê bikşînin;

Hejmara kontoyê :
Şîfreya bankê (BLZ) :
Bank :
Xwediyê kontoyê :
Dem û cîh:
Destnîşan:

Anjî ezê bihayê abonetiyê bişînim ser kontoya Rûdaw ya li jêr û dekontoya wê ji navnîşana Rûdaw re bişînim.

• Bihayê abonetiyê salekê ji bo nav **Almanyayê: 60 Euro**

Ji bo abonetiya derveyî Almanyayê, pêwendî ligel Rûdaw deynin.

Navnîşan
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln / Almanya
info@rudaw.eu

Abonetî

Hesabê Rûdaw
Bank Deutsche Bank Köln
Konto Nr 2450161
BLZ 37070024

Elif jibo Şandina Cenazeyan
أليف لخدمات دفن الموتى
مساعدات فورية في حالة الوفيات
Arina Travel Berlin Reisebüro Transport
ŞABAN ÇITLAK
Em cenazeyan ji Almanyayê digîhîn hemu cîhan û herçar beşên Kurdistanê
الإيصال حتى الوطن / الرعاية والإستشارة
Blaschkoallee 73
12359 Berlin
saban.citlak@gmx.de
Peywendîkirin bi kurdî
030 569 769 45
0179 675 40 21
TEL: 030 915 943 94 FAX: 030 287 084 05 MOBIL: 0176 215 111 73

Parêzer Uzun Buroya Parêzeriyê
Em li seranserê Almanyayê di xizmeta we de ne
Reklam
Beşên me yên kar
Dadweriya Kar (Arbeitsrecht)
Dadweriya Aborî (Wirtschaftrecht)
Dadweriya Trafîkê (Verkehrsrecht)
Dadweriya Werzîşê (Sportrecht)
Dadweriya Peymanê (Vertragsrecht)
Dadweriya berpirsiyariya pizîşkî (Arzthaftungsrecht)
Parêzer Oktay Uzun
Navnîşan:
Sonnemannstr. 3
60314 Frankfurt am Main
Tel.: 069 – 49 600 87
Fax: 069 – 49 600 88
email: info@kanzlei-uzun.de
web: www.kanzlei-uzun.de

PARÊZER / RECHTSANWALT
Bariş Yeşil
Tel.: 0231 - 95 01 85 40
Fax: 0231 - 95 01 85 41
Mobil: 0177 - 17 60 359
Schwanenwall 5
44135 Dortmund
info@ra-yesil.de
www.ra-yesil.de
PARÊZERÎ Û ALÎKARIYA WE BI ZIMANÊ ME

www.arsivakurd.org

Bêcirman Bêcirmanî
Dortmund

Festîvala Navneteweyî Ya Çanda Kurdî 21emîn car li dar ket

Kevneşopiya Festîvala Kurdan vê carê li Dortmunda Almanyayê berdewam kir. Festîvala ku îsal 21emîn car ji hêla Yekîtiya Komalên Kurd li Almanya (YEKKOM) ve hate lidarxistin, tevî konser û bernameyên muzîkê û peyamên siyasî birêve çû.

Festîvala Navneteweyî Ya Çanda Kurdî îsal ji bo bîranîna Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan, Leyla Şahlemez ku li Parîsê di encama reşkujiyekî de jiyana xwe ji dest da bûn û kesên li Rojava jiyana xwe ji dest dane hate lidarxistin. Bi taybetî Kurdên li Almanya, welatên derdorê yên mîna Fransa, Holanda, Belçîka û Swîssreyê bi trên, otobos û otomobîlên xwe yên taybet berê xwe dan qada festîvalê ku şemiya borî hate lidarxistin.

Hevserokê Koma Civakên Kurdistanê Cemîl Bayik bi riya sînevîzyonê beşdarî li Festîvalê kir û bal kişand ser qedexeya PKKê ya li Ewropayê, pêvajoya çareseriyê û geşedanên li Rojavayê Kurdistanê diqewimin. Bayik di axaftina xwe de xwest ku Kurdistaniyên li Ewropayê derbarê qedexeya PKKê de zêdetir têbikoşin. Hevserokê KCKê xitimandina pêvajoya çareseriyê xiste stûyê Hikûmeta Tirk û got ku li pey êrîşên Rojava tiliya dewleta Tirk heye.

Gellek sazî, rêxistin û aliyên siyasî jî li festîvala şemiya borî li Westfalenhallenparka Dortmundê pêk hat amade bûn. Li qada festîvalê gelek stand hatibûn vekirin. Yek ji standên ku herî bala mêvanan dikişand Konê Dengbêjan bû. Her wiha nivîskarên Kurd di standên kitêban de bi xwendevanên xwe re sohbet kirin û kitêbên xwe îmze kirin.

Demîrtaş: "Bila Almanya û Fransa piştevaniya pêvajoyê bikin"

Di festîvalê de ji bilî siyasetmedarên Alman Ulla Jelpke, Stefan Engel, Bernhard von Grunnberg; Hevserokê KNKê Tahir Kemalîzade, Hevserokê PYD-ê Salih Mûslim û Hevserokê BDP-ê Selahattîn Demîrtaş jî axivîn.

Demîrtaş di axaftina xwe de diyar kir ku heke mûzakere bi awayekî bimeşin, di mehên pêş de heye ku geşedanên gelek girîng pêk werin. Hevserokê BDPê eşkere kir ku Almanya û Fransa heta niha piştgiriya pêvajoya çareseriyê nekirine û doza piştevaniyê li wan kir.

Di festîvalê de gellek komên govendê ji herêmên Kurdistanê yên cuda hunerên xwe pêşkêş kirin. Ji bilî dengbêjên Kurd, Zarokên Aramê Dîgran, Jînên Mezopotamyayê, Dengê Ciwanan, Kilamên Me, Abdal-Haluk Tolga İlhan, Serhado û Koma Berxwedan bi stran, kilam û govendên bernameya festîvalê qedandin.

Lêçûna wî 10 milyon Dolar e

Pêlava çavgirtî dibe girantirîn fîlmê kurdî

"Eger em nikarin cîhanê têxin firokeyekê û bigihînin Kurdistanê, divê em berevajiyê vê yekê bikin." Ev peyama fîlmê "Pêlava çavgirtî" ya derhênerê kurd Key Behar e. Ew bi awayekî jixwebawer dibêje ku dema fîlmê wî biqede, ewê li nav fîlmên kurdî yên ku heta niha hatine çêkirin bibe yê herî pêşeng.

Rûdaw: Fîlmê te derbarê çi de ye?

Key Behar: Çîroka vî fîlmî derbarê kurekî temen 10 salî yê bi navê Tîşko de ye. Li ser astengiyên ku dikevin pêşiya pêkanîna xewnên wî de ye. Tîşko gellekî ji lîstika futbolê hez dike. Herwiha bandoreke xurt a lîstikvanê navdar "Pelé" li ser wî heye. Tîşko cîhanê li gor hevtemenên xwe bi nêrîneke cuda dibîne. Ev hêviya nifşê nû ye. Çîroka tîşko di vî fîlmî de rengdana çîroka gelê me ye.

Gellek fîlmên kurdî ji aliyê derhênerên kurd ve hatine berhemkirin û festîvalên navdewletî hatine nîşandan. Çi cudahiya fîlmê te ji yên din heye?

Yekemîn fîlmê kurdî ye ku bi zimanê ingilîzî berhem dibe. Lê ev ne take taybetmendiya sereke ya vî fîlmî ye. Fîlm bêhtir sepandinê li ser qurbanîdana gelê kurd dike. Karekter, çîrok û lehengên gellek fîlmên kurdî ku hatine çêkirin nediyar in. Li şûna wê hewl dane bi rêya rewşa siyasî ya kurdî û bangeşeya alîkarî û dilovaniya pêdeçûnê, dîroka çewisandina Kurdan nîşan bidin. Ev peyam di fîlmê min de nînin. Berevajiyê vê yekê, Tîşko her hewlê ji bo serketin û gihîştina xewnên xwe dide. Ne qurbanî ye lê bêlê leheng e. Fîlmên din ên kurdî ji bo bînerên navdewletî hatine çêkirin. Bi sedema heyber û naveroka çîroka xwe ti fîlm ji wan negihiştine bazara sereke ya sînemayê. Herwiha ji bo festîvalên navnetewî ne guncaw in.

Tu bi rêya vî fîlmî hêvîdarî bidestxistina çi yî?

Bêguman dixwazim xwe wekî derhênerê fîlm nîşan bidim. Ji bo pêkanîna van encaman jî yekem berhem girîng e. Lê armanca min gellekî bêhtir e ji wê yekê ku tenê wek derhêner derkevim pêş. Pêwendiya mezin ya vê amancê jî bi bav û kalan ve heye. Min jiyana xwe wekî kesekî ku li jêr desthilateke dîktatorî ya wekî ya Sedam Husên bire sêrî. Ji temenê 14 salî û pê de tenê ji bo ku Kurd bûm pêrgî êşkencê hatim. Daxwaza Tîşko jî wekî ya derhêner Key Behar pêkanîna xewnên wî ye. Herwiha xewnên gelê kurd ên ji bo pêkanîna azadî û serxwbûnê ne jî.

Gelo ev fîlm dibe girantirîn fîlmê kurdî ku heta niha hatiye berhemkirin?

Budçeya vî fîlmî dibe 8 heta 10 milyon dolar be. Ev dike ku girantirîn fîlm yê heta niha li Kurdistanê hatibe çêkirin. Lê fîlm dibe berhemkirina Kurdistan û Brîtanyayê. Bi rastî ev budçe ji bo fîlmekî mezin yê wekî “Pêlava çavgirtî” ne ewqasî bilind e.

Tu pêşbîniya ti astengiyeke din ya di pêkanîna vê amancê de dikî?

Berhemanîna fîlmekî baş bê astengî nabe. Ev yekem fîlm e ku bi zimanê ingilîzî li Kurdistanê were kişandin. Lê em berhemhênerên fîlmê Fût Prênt û Çûka herdem amade ne bi awayekî profesyonel heq ji van astengiyan derkevin. Wekî mînak berî wênegirtina fîlm yekem car em xema dîtina dabeşkirinê dixwin. Di vê qonaxê de mezintirîn astengiya me peydakirina budçeya pêwîst ya ji bo fîlm e. Bi gera me ya dawî ya li Kurdistanê berpirsên hikûmeta Herêma Kurdistanê û şirketên berhemhêner pêşwaziyeke germ ji me re kirin. Xelkên navçeyê jî bi heman şêweyî em pêşwazî kirin û ji ber vê çendê em ji bo peydakirina budçeya pêwîst ya vî fîlmî geşbîn in.

Fot

Di nerîna te de sînema ji bo nasandina cîhana derve ya Kurdan û doza wan baştirîn rê ye?

Belê, ti kenaleke din a medyayî nîne ku wekî fîlmê dokûmenterî û yê xeyalî xurt be. Bi taybet jî fîlmê xeyalî, eger ji bo hejmareke mezin ya bînerên navdewletî hatibe berhemkirin. Baştirîn nimûne fîlmê Titanic e. Berî belavkirina vî fîlmî xelkê li cîhanê çiqasî çîroka wê zanîbûn? Gellek çîrokên gelê kurd yên taybet hene. Hemû çîrokên trajediyê ne. Berevajî wê jî çend çîrokên xeyalî û efsaneyî yên ku bav û kalên me gotine hene. Lê ev çîrok ne di çarçoveya pirtûkan de ne. Vê yekê bi xwe jî kir ku li xurtiya gotina çîrokê mikur werim. Bavê min berî razanê çîrok ji min re digotin. Eger ev çîrok bi awayekî sînemayî bên pêşkêşkirin, wê wêneyekî cuda yê Kurdistanê nîşanî cîhanê bikin.

Te aktor bo vî fîlmî dîtine?

Me hêjî dest bi kastkirina fîlm nekiriye. Lê pêwîstiya me ji bo balkişandina bînerên navnetewî bi kêmasî ve bi 2 aktorên navdar ên Hollywoodê heye. Emê di demeke kurt de pêwendiyê ligel rêveberekî baş ê kastê ji bo destpêkirina pêvajoya kastkirina film daynin.

Hevpeyvîn:
Têsa Manwêlla
London

www.arsivakurd.org

Kêfxweşa hilbijartinên Almanyayê dîsa Merkel e

Kurd bi hişmendiya berê dîsa bi ser neketin

Zekî Ozmen

Li Almanyayê roja yekşemê hilbijartinên giştî pêk hatin. Partiya serokwezîra Almanyayê Angela Merkel di encama hilbijartinan de serkeftinek mezin bi dest xist lê belê şirîka hikûmetê FDP benda hilbijartinê derbas nekir. Ji hêla din ve namzetên parlamenteriyê yên ku bi nasnameya xwe ya kurdî derketin pêş nehatin hilbijartin. Lê belê yekem car hejmareke bilind ya parlamenterên eslê xwe ji Tirkiyeyê ketin di parlamentoya Almanyayê de.

Êdî li parlamentoyê deh parlamenterên ji Tirkiyeyê hene

Li gor encamên fermî yên hilbijartinê, Partiya Xiristiyanên Demokrat (CDU) ku bi serokwezîr Angela Merkel li ser hikûm e, % 41,5ê dengan wergert. Partiya Demokratên Sosyal (SPD) careke din bû hêza duyemîn û % 25,7ê dendagan stand. Bi rêzê Partiya Çep (Die Linke) bi % 8,6 û Partiya Keskan (Die Grunen) jî bi % 8,4ê dengan ketin di parlamentoyê de. Ji hêla din ve şirîka biçûk ya hikûmeta Almanyayê derbeyek mezin xwar û bi standina % 4,8 nekarî benda hilbijartinê ya ku ji % 5ê pêk tê derbas bike. FDP bi vê yekê ji sala 1949ê ve yekem car e ku nekarî bikeve di parlamentoyê de. Surprîza vê hilbijartinê jî Partiya Alternatîfa Almanyayê (AfD) bû. Ev partiya ku ev demeke kurt e ji hêla ekonomîstên mûhafazekar ve hatiye damezirandin û li dijî pergala pereyên Euro li Almanyayê ye, yekem car beşdarî hilbijartinan bû. Li gel vê yekê jî AfDê % 4,7ê dengan wergirt û lê digel vê jî nekarî bendê derbas bi.

Deh namzetên ji Tirkiyeyê bi ser ketin

Aliyekî din ên balkêş ê hilbijartina vê carê jî ew bû ku yekem car e hejmareke bilind ya namzetên eslê xwe ji Tirkiyeyê ye ne wekî parlamenter hatin hilbijartin. Hejmara parlamenterên bi eslê xwe ji Tirkiyeyê di salên derbasbûyî de nedigihiştî 5 kesan lê belê di van hilbijartinan de ev hejmar bû deh parlamenter. Digel parlamenterên cara yekemîn hatin hilbijartin, parlamenterên berê yên mîna Cem Ozdemir, Ekin Deligoz, Sevim Dagdelen û parlamenterê eyaleta Berlînê Ozcan Mutlu jî hene.

Hinek kêfxweş in û hinek jî matmayî mane

Li gor encama hilbijartinan ti partî nikarin bi serê xwe hikûmeta nû damezirînin. CDU ya ku herî gellek deng standin, wê di rojên pêş de ji bo pêkanîna koalisyonê hevdîtinan ligel partiyên din bike. Angela Merkel wekî berteka yekemîn ya hilbijartinan diyar kir ku wan encameke gellek baş bi dest xistiye û bi awayekî berpirsiyarî ew ê li vê baweriya ji wan re hatiye dayin xwedî derkevin. Sernamzetê SPD, Peer Steinbruck jî got ku niha top li ber lingê Merkel e û divê niha ji xwe re li şirîkekî bigere. Ji hêla din ve serokê FDP Philipp Rosler xemgîniya xwe wiha anî zimên: “Ev serdema herî bi êş û xemgîn ya di dîroka FDPê de ye.“

Ji ber daketina dengên Partiya Keskan, sernamzetê vê partiyê Jurgen Tritten destnîşan kir ku ji bo sererastkirina vê rastiya nexweş, ewê têbikoşin. Serokê fraksiyona Die Linke, Grefor Gysi jî dîroka partiya xwe bi bîr xist û wiha axivî: “Ma kî di sala 1990ê de bawer dikir ku partiya me wê di parlamentoyê de bibe hêza sêyemîn.“

Namzetên bi kurdbûna xwe derketin pêş bi ser neketin

Di nava partiyên alman de nêzîkî deh namzetên kurd jî hebûn û bi taybetî hêvî hebû ku ji partiya Die Linke, Ayten Kaplan, Behiya Uca û herwiha Bêrîvan Aymaz a ji Die Grunen werin hilbijartin. Lê belê hersê namzetên ku bi xwedîderketina nasnameya xwe ya kurdî derdiketin pêş, serketinbidest nexistin û ji derveyî parlamentoya Almanyayê man. Behiya Uca bi rêya medyaya civakî spasiya hilbijêrên xwe kir û diyar ku digel ew nehatiye hilbijartin jî lê wê serkeftinek mezin bidest xistiye : »Ev cara yakemîn bû ku partiya min li herêma Celle ya ez lê namzet bûm hejmareke evqas bilind ya dengan stand û ev serkeftineke mezin bû ji bo min. » Herwiha Ayten Kaplan jî spasiya piştgirên xwe kir û diyar kir ku digel ew nehatiye hilbijartin jî, ew gellekî serfiraz e ku partiya wê di parlamentoyê de rêza sêyemîn bidest xistiye.

Behiye Uca

Berîvan Aymaz

Ayten Kaplan

`Stratejiya kurdan ya hilbijartinê çewt e`

Namzetê partiya Die Linke yê Coesfeldê, Alî Atalan derbarê encamên hilbijartinan de ji Rûdawê re axivî û diyar kir ku pêwist e êdî kurd hişmendiya xwe ya derbarê partiyên li Almanyayê de biguherin.

Atalan ku kevneparlamenterê eyaleta Nordrhein-Westfalen e, bal kişand li ser wê yekê ku pirraniya namzetên ku bi kurdbûna xwe derketin pêş wekî namzetên dîrekt yê herêman hatine destnîşankirin. Herwiha yên ketine di rêzên eyaletan de jî di rêzên paş de bûn. Lê belê çewtiya herî mezin ew e ku Kurd bi helwesteke demodebûyî xwe dikin namzet : «Ez bi xwe bi awayekî sembolîk bûm namzetê dîrekt yê herêma ez lê dimînim. Jixwe şansê hilbijartina namzetên dîrekt yên herêman yên partiyên mîna Die Linke, FDP û Partiya Keskan hema bêje nîne. Lê belê pirsgirêka me Kurdan bi xwe heye. Me mentalîteya li Kurdistanê aniye Almanyayê ; Berê li welêt axa hebûn, diçûn cem partiyan û digotin evqas dengên min hene û kurê min bikin parlamenter. Ku partiyekî qebûl nekiriba, diçûn cem partiyeke din. Kurd niha jî bi heman mentalîteyê li Almanyayê tevdigerin.»

´Em li partiyên alman bi çavên partiyên biyanî dinêrin`

Alî Atalan diyar kir ku pêwist e ciwanên kurd yên bi zimên dizanin û zîrek in, bikevin di nava partiyên alman yên nêzîkî fikrên xwe yên siyasî û wiha dewam kir : « Dema bi niyeta tu bibî parlamenter, tu bikevî di nava partiyekî de, ji xwe ew jî vê yekê fêm dikin. Di destpêkê de divê mirov bi siyaseta xwe bi partiyê bide pejirandin û di warê pirsgirêkên li Almanyayê de çalak be. Pirsgirêkên xaniyan hene, pirsgirêkên betalan û gellekên din ên civakî, aborî û hawîrdorê hene. Di dereceya duyemîn de bila mirov alîkariya gellê xwe bike. Em hêjî li partiyên alman bi çavên partiyên biyanî dinêrin lê ev partiyên me ne. »

Derbarê namzetnîşandana parlamentaran de jî Alî Atalan wiha axivî : “ Divê Kurd bi mentalîteya bazirganiyê nêzîkî meseleyê nebin. Ev mentalîteyeke taloke ye. Ez kêmasiyan di mentalîteya ku Kurd pê dimeşin de dibînim. Mixbin, em xemgîn in ku kesek nehat hilbijartin lê divê di destpêkê de em xwe rexne bikin.“

Parlamenterên nû yên bi eslê xwe ji Tirkiyeyê

Aydan Ozoguz (SPD, Hamburg)
Metin Hakverdi *(SPD, Hamburg)*
Gulistan Yuksel (SPD, Monchengladbach)
Mahmut Ozdemir *(SPD, Duisburg)*
Cansel Kiziltepe (SPD, Berlin)
Ekin Deligoz *(Die Grunen, Neu-Ulm)*
Cem Ozdemir (Die Grunen, Stuttgart)
Ozcan Mutlu *(Die Grunen, Berlin)*
Sevim Dagdelen (Die Linke, Bochum)
Cemile Giousouf *(CDU, Recklinghausen)*

www.arsivakurd.org

Wêne: Rûdaw

Dr. Mucahît Bîlîcî kî ye?

Li Jay College a City University of New Yorkê (CUNY) Hîndekarê beşê sosyolojiyê ye. Derbarê xebatên teoriya civakî, Bedîûzzeman Seîdê Kurdî, Civaka Tirkiyê û Nasnameya Kurdan de tê naskirin. Dr. Bîlîcî yê ku qunciknivîsê rojnameya Tarafê ye, ji Farqîna Amedê ye.

Sosyologê kurd Dr. Mucahît Bîlîcî:

'Divê Kurd bibin hakimê dewletên lê dijîn'

Sosyologê kurd Dr. Mucahît Bîlîcî ku li Jay Colleg a City University of New Yorkê (CUNY) hîndekarê beşê sosyolojiyê ye, diyar dike ku parçebûna Kurdan a tarîxî ji bo wan êdî ne dezavantaj e lê ber bi avantajê ve vediguhêze.

Li gorî Bîlîcî geşedanên li Rojava dide çespandin ku ***'Kurd êdî nema têne zeftkirin.'*** Sosyologê Kurd eşkere dike ku dema ew pêvajoya aştiya li Tirkiyê û destkeftiyên li Rojava bi hev re dinirxînin, tabloya li seranserê Kurdistanê bi awayekî zelaltir dibînin. Bîlîcî dibêje; ***'Heke Kurd di bin banê dewleteke serbixwe de nikaribin bêne cem hev jî, divê armanca wan a sereke ew be ku bibin hakimê dewletên lê dijîn.'***

Rûdaw: Em dibînin ku di hevdîtinên aştiyê yên di navbera hikûmeta AKPê û PKKê de hê jî gavên berbiçav nehatine avêtin. Gelo çi hêviyên cenabê we ji pêvajoyê hene?

Dr. Mucahît Bîlîcî: Ez jî wekî herkesi bi hêvî me û dixwazim hêviya min berdewam be. Lê piştî bangawaziyên bi rengê; "eman bila kes nederîne, pêvajo gelek hesas e", ji bilî sekinandina pevçûna şer, tiştekî berbiçav xuya nake. Hem AKP, hem jî rêxistin (PKK) bi ya min etîkî tevnagerin. Wisa xuya ye ku ji bo wan silameta rêxistinî girîngtir û pêşdetir e.

Di vê pêvajoyê de hûn helwesta hikûmetê çawa dinirxînin?

Hikûmet dixwaze ti maliyetê daneyne pêşiya raya giştî û bêyî ku berdêlekê bi wan bide dayîn çareser bike. Ev hem rêbazeke karîger e hem jî ji karîgeriyê dûr e. Hem jî hurmeta ku pêwîst e nîşanî Kurdan nade. Divê raya giştî ya Tirk fêr bibe û qebûl bike ku Kurd gihîştine asta wan û wekî wan in. Kirina vê yeke peywira hikûmetê ye.

Heke li Tirkiyê aştiya bi Kurdan re pêk were, gelo wê hevkêşeyên siyasî çawa biguherin û ber bi ku ve herin?

Heke li Tirkiyê aştiya bi Kurdan re pêk were, wê siyaseta kurd zêdetir dergehên xwe ji çanda olî re veke. Demokratîkbûn wê neçar bike ku siyaseta kurd bi îslamê re aş bibe. Her wiha siyaseta kurd a ku neçar e rikeberiya siyaseta tirk bike, wê berfirehtir bibe û wê ji bo aktorên li derveyî PKK û AKPê, qadeke mezin a vegotin û derbirînê vebe. Ev her du aktorên ku dixwazin vê qadê bi dest bixin, wê neçar bimînin ku veguherin. Fikra min ew e ku hem di nav Tirkan de, hem jî di nav Kurdan de geşedana cudabûna kemalîst û demokratan wê bibe diyardeyeke girîng.

Di pêşerojê de em dikarin behsa aloziyeke di navbera AKPê û cemaeta Gulen bikin?

Di dawiyê de AK Partî neçar e bi cemaetê re li hev bike. Heke hêrsa şexsî û hestiyarî nekeve pêşiya aqilê pragmatik, pêwîst e ku AK Partî bi cemaetê re aş bibe. Lê heke alternatîf derkevin holê, heye ku rewşa heyî bikeve merhaleyeke cuda. Heke Abdullah Gul û pêkhateyeke nû, wekî alternatif derkeve holê, wê gelek tişt biguhere.

Bi nihêrîneke ji Amerîkayê, wekî pisporekî kurd, cenabê we li Rojhilata Navîn û Ewropayê dahatûya gelê Kurd çawa dibêne? Ragihandina dewleteke kurdan a serbixwe wê bibe sedema encamên çawa?

Baweriya min bi edaleta Xwedê heye. Înşelah wê rojekê Kurd bigihîjin azadiya xwe. Ne şert e ku ev yek di bin banê dewletekê de bibin. Lê divê Kurd bibin xwediyê dewleta ku di bin îdareya wê de ne. Yanî ji bo min Kurdistaneke serbixwe û tekane şert nîne. Heye ku formasyonên cudatir û mezintir hebin. Lê ji bo ku Kurd asta netew-dewletê derbas bikin, pêwîst e, netew dewletên Tirk, Ereb û Farisan derbas bikin. Ji bo ku Kurd meseleya netewê derbas bikin, divê bibin Kurd; ji bo dewletê derbas bikin jî divê bibin xwediyê dewletê. Kurd dikarin tevî Tirkan bibin xwediyê dewletê. Lê divê teqez bibin xwediyê dewletê. Pêwîst e Kurd li her dewleta lê dijîn, bibin xwediyê desthilatdariyê.

Geşedanên li Rojava yekser bû kêşeya sereke ya Kurd. Tevahiya dinyayê bi baldarî berê xwe daye vê herêmê. Hûn pêşeroja Rojavayê Kurdistanê çawa dibînin?

Divê bi kêmasî Rojava otonomiya xwe bi dest bixe û li Suriyeke nû ava bibe de bibe yek ji diyardeyên avakar. Dabeşbûna Kurdan di nava çar dewletan de, heta niha li dijî kurdan bû. Lê vê gavê ev rewş di sûdmendiya Kurdan de ye. Kurd hatine asteke wiha ku nema tenê zeftkirin. Înşelah wê bigihîjin azadiya xwe ya kamil.

Gelo hûn têkiliyên Hikûmeta Kurdistanê bi partiyên din ên kurdan, Hikûmeta Navendî ya Iraqê, cînarên derdorê û dewletên rojava re çawa dinirxînin?

Siyaseteke gelek baş dimeşînin. Ne li gorî rêçikên îdeolojîk lê bi hurmeteke kamil a li gorî çanda civaka ku temsîliyeta wê dikin tevdigerin. Ev tiştekî gellek baş e. Divê çar parçeyên Kurdan jî tiştên hev ên baş û nimûneyî ji hev wergirin. Şîreteke min li Hikûmeta Kurdistanê heye: Divê di nava hemwelatiyên xwe de daxwaza rûhê hewldan û dahênaniyê bi pêş bixin. Divê Kurdistan di asta dewleteke petrole de nemîne. Perwerdehî û dahînanî sermiyana herî girîng e.

Hêvî û daxwazên we ji Kongreya Neteweyî ya Kurd çi ne?

Heke pêk were, ez di wê baweriyê de me ku kongre ji hêla sembolîk ve gellekî girîng e. Ferz e ku Kurd pişta xwe bidin hev. Birayên din ên Misilman jî divê ji vê rewşê kêfxweş bibin. Piştgirîdayîna çar Kurdistana ji hêla çandî, ekonomîk û siyasî, wê li herêmê bibe piştgiriya aştî û entegrasyona welatên din ên misilman. Wê kongre bibe bingeha yekîtiya Kurdan. Divê teqez bê kirin û divê bê çespandin ku Kurd xwediyê îradeyekê ne.

Ezbenî çavdêriya we ya li ser veguherîna PKKê ya di van salên dawî de çawa ye? Gelo heye ku di demen pêş de di nava Kurdan de şer û pevçûnên olî û îdeolojîk derkevin? Ji bo jiholêrakirina van rîskan divê mirov çi bike?

Doza siyaseta PKKê mafdar e lê dezgeh û îdeolojiyên bi kar tîne bere dûrî gel bûn. Di vî warî de di salên dawî de bi taybetî bi pêvajoya aştiyê re veguherîneke cidî heye. PKK mezintirîn organizasyona Kurdên Tirkiyê ye. Divê ev yek bi awayê oldarî û medeniyeta kurdan eşkere bike, demokratîze û girseyî bibe. Jixwe heke PKK vê yeke neke wê nikaribe hebûna xwe biparêze.

hûn bixwe yek ji wan kesan in ku nêzîkî fikir û ramanên Seîdê Kurdî ne. Em dibînin ku fikren Seîdê Kurdî di tevgera siyasî ya Kurd de dernakevin pêş. Sedema vê yeke çi ye?

Bedîûzzeman Saîdê Nûrsî zatekî Kurdistanê ye. Ew alimekî wisa mezin e ku ne tenê Tirkiye, ne tenê alema îslamê, wê rojek were tevahiya mirovahiyê bi têra xwe qedrê wî bizanibe. Bedîûzzeman di serdemeke wisa de ku pê dihesiya îslam di ewlekariyê de ye, bi awayekî lokal eleqedarî nîşanî kêşeyên li Kurdistanê daye. Li Stenbolê di vî warî de xebitiye. Lê kengê dîtiye ku alema îslamê hem piraniya Kurdan, hem piraniya Tirkan pêrgî "krîza îmanê" bûne, hingê siyaset û kêşeyên taybet ên Kurdan daniye aliyekê û dest avêtiye kêşeya herî gerdûnî û herî acîl. Îro li Tirkiyê şoreşeke demokratik pêk hat. Aktorê vê yê ku xuya nake Bedîûzzeman e. Dikarim bibêjim ku îro di serî de bi saya xizmetên telebeyên Rîsaleya Nûr, kêşeya îmanê çareser bûye û dîktatoriyeta Kemalîst hatiye rûxandin. Her wekî Tirkan, di warê parastina îmanê û xizmeta ji bo îslamê de xofên Kurdan jî hene. Li hêla din meseleyeke Kurdan a din jî heye. Ew jî ev e; Divê Kurd ji tehakûma li ser navê Tirkan tê kirin rizgar bibin. Ev ne tenê meseleya Kurdîtiyê ye, meseleyeke edaletê ye. Bedîûzzeman Seîdê Nûrsî, di navbera Kurdistan û Anatoliyayê de girîngtirîn pir e. Tirk neçar in hem rastiya Kurdistanê, hem jî kurdîtiya Bedîûzzeman a ku heta niha jî nexwestine bibînin, nas bikin. Bedîûzzeman wê di siyaseta Kurdistanê û di medeniyeta nû de di qada pêş de cih bigire. Bedîûzzeman stêrkeke hemdem a îslamê ye û şayanê pesindanê ya Kurdistanê ye.

Rexne hene ku hin şopînerên sereke yên Seîdê Kurdî –çi bi zanebûn, çi bêhemdî- bûne sedema rewşeke wiha. Nêrînên bi vî rengî çiqas rast in?

Herdem ji ber niyeteke xerab nebe jî, ji bo ji zerûriyet û rizgariya propogandaya dewletê, nasnameya Kurdî ya Bedîûzzeman dihate înkarkirin. Lê vê gavê hinek kes xwedî li vê tirsa Kemalîst derdikevin û ji wan weye rastî ev e. Wê rojek were telebeyên Nûrsî jî hişyar bibin û hay ji rastiyê hebin.

Şîrove hene ku geşedanên li Suriye û Misrê bûne sedema temambûna Bihara Erebî. Cenabê we tevlî van şîrove û ramanan dibe yan na?

Bi saya bayên berevajî radibin, bihar sekiniye, heye ku niha werza nivistanê li dar e! Lê teqez wê bihar were. Sibeha her şevê, bihara her zivistanê heye. Çawa ku hişyariya misilmanan nema tê taloqkirin, wisa jî hişyarî û azadiya Kurdên çar parçeyan nema tê berbendkirin.

Hevpeyvîn:
Ergulen Toprak - *New York*

Înşelah û maşelah!

Selahattin Çelik

Bi peymana DYA û Rûsyayê ya li ser Sûriyê, çekên kimyewî yên Sûriyê, yên bi hezrî dora hezar ton, divê bên tinekirin. Înşelah, ji ber ku mirov bi soz û sondên Şamê bawer nabe. Maşelah, ji ber ku wekî DYA û Rûsya dikarin li hev werin. Lê çima hewqas dereng man? Ma guneh û şerma sed hezar miriyan ne di stûye wan de ye jî?

Him qedexe dikin, him jî bi kar tînin

Çekên kîmyewî, an jî yên jehrî, hewqas kujîner û rûxiner in ku hilberîn, firotin û bikaranîna wan qedexe ye. Bi navê OPCW (1997) Dezgeha Qedexekirina Çekên Kîmyewî heye. Nîjadkujiya Halepçeyê (1988) ji bo peymana OPCWê bibû çirûskek. Lê Îsraîl û Sûrî jî di nav wan de, hêj heft dewletên peyman îmzenekirî hene.

Almanan hêj di Şerê Cihanê yê 1mîn de (1914-18) li himberî Frensiyan çekên jehrî emilandibûn. Îngilîzan jî ew li Rûsyayê li himberî Bolşevîkan (1918-19), û Başûrê Kurdistanê jî tê de, li koloniyên xwe bikaranîbûn (1920an). Piştî Şerê Cîhanê yê 2mîn (1939-45), DYAyê pisporên alman yên çekên jehrî biribûn Amerîkayê û ew di bernameyên çekên kîmyewî de dabûn şixulandin. Ji bo DYAyê cihê ceribandina çekên kîmyewî Vîyetnam bû (1954-75), ne tenê napalm jî tê de, 8 mîlyon ton bombe avetibûn Vîyetnamê, ku hêza wan yeksanê 640 Hîroşîmayê bû, lê bi jehrê bêsînor zevî û daristan qelandibûn.

Bi pêşdestiya DYA û Yekîtiya Sovyetan (1989) OPCW hatibû damezrandin, lê di pratîkê de bi bayê bezê hilberin, firotin û bikaranîna çekên jehrî berdewam dikir. Iraqê li himberî artêşa Îranê ew çek bikaranîbûn (1980-88). Sovyetan (Rûsya), Almanya û Holendayê materyalên çekên kîmyewî firotibûn Iraqê û ew jehr li Halepçeyê hatibû bikaranîn. Fîrmayên firoşker eşkere bûn, lê tenê li Holendayê derbarê hinekan de doz hat vekirin. Lê DYAyê jî bi rêya fîrmayên îtalî û arjantînî materyal û çekên qedexekirî firotibûn Iraqê.

Em werin bûyera îroyê. Eşkere bû ku bi destûra hikûmetan şîrketên îngilîz û heya 2006ê jî yên alman materyalên kimyewî firotibûn Baasa Şamê. Şam weke tepikê hecê tê tawanbarkirin, lê firoşker, sedemkar û yên din?

Gelo rêya çareseriyeke bi hevdîtinên siyasî vebû?

Peyam û qeliqînî wisa ne, ji NY, Şam û hevalbendên wê peyamên 'xweşbîniyê' hene. Lê mirov ji dilpaqijiya aliyan şikdar e. DYA êrişa cezakirinê di rojevê de dihêle. Rûsya jî berevajiyê dibêje. Û ya misoger: Însyatîf û hevkariya DYA û Rûsyayê nîşan da ku ben di destên herduyan de ye. Dev ji serkarên herêmî berdin, dewletên weke Îngilîstan, Frensa û Çîn jî li derve man. Çima bi vê pêşaniyê DYA û Rûsya hevkariya xwe ji bo çareserkirina siyasî jî pêş ve nebin? Eger na, nediyarî ji bo hemû herêmê elameta kerasetên mezintir e.

> **Tirkiye heya qirikê ketiye heriyê. Di serî de rûxandina desthilata Şamê ji bo Enqerê xewneke hêvîdar bû, lê vêga ziviriye xewnereşkê.**

Hewldanên Tirkiye û Îranê

Tirkiye heya qirikê ketiye heriyê. Di serî de rûxandina desthilata Şamê ji bo Enqerê xewneke hêvîdar bû, lê vêga ziviriye xewnereşkê. Bi qeyrana li Sûrî û Misirê bazirganiya Tirkiyeyê derb xwariye. Têkiliyên bi komên tundrew yên îslamî re Tirkiyeyê dihetikîne. Bêguman li vir durûtiya dewletên rojavayî hêjahî binxêzkirinê ye, ji ber ku çav li Tirkiyeyê digirin.

Di însyatîfa navneteweyî de rola Enqerê li binî ye. Divê mirov serdana serokkomar Abdullah Gul a Amerikayê di vê çarçoveyê de binirxîne. Dibe ku Washington erka nû ya xulamtiyê pê bide jiberkirin. Ji ber ku dibe ku DYA û Rûsyayê gellek tiştên din jî bihevre pijandibin. Çi be jî, ya diyar ev e: Weke ji mêj ve diyarde ye, çiqas diçe dewleta tirk ji ruxandina desthilata Baasê zêdetir, giraniyê dide şikandina tevgera Kurdên Rojava. Têkiliyên Enqere-al Nusrayê, yên Enqere-Hizbullahê yên serdema 1990an têne bîra mirov.

Bi serokkomariya Hesen Rohanî, Îran dixwaze ambargoya aborî bişikîne. Ji bo danûstandinên siyasî, di navbera hêzên dijber ên Sûriyê de pêşwaziya navcîtiyê dike. Lê Îran di şerê Sûriyê de aligirekî eşkere ye û hîleta dewletên Sunnî jê diçe. Ji ber hewldana çêkirina çeka atomî, ji aliyê qempa DYAyê ve hatiye dorpêçkirin. Hêzên navborî hemû dizanin ku melayên Îranê çi kone, dekbaz, gelac û bêbext in û di şaşikên wan de çi fen û fût hene. Ji ber vê yekê, di şert û mercên heyî de ti şensê biserketina manevrayên Tehranê tine ye.

Herçiqas herdu li du aliyên nakokiyê disekinin jî, hewldanên Tirkiye û Îranê dişibin hev. Herdu jî li herêmê dûv di giraniyê de ne. Bi nokerî be jî, dixwazin di planê DYA û Rûsyayê de cih bigirin. Parastina statûkoyê, ango bi hevkarî parastina koletiya Kurdan dikin. Ne tiştekî sosret e ku tevî nakokiyên heyî jî, herdu dewlet di nav danûstandineke veşartî ya yekdevî de ne.

Di nav rastî û xeletiyê de PYD û erkên awarte

Çapemeniya navneteweyî navê PYDê jî di nav beşdarên civîna Cenevreyê de dide. (Lê ku bibe?). Çibe jî, PYD an jî tevgera kurd a Rojavayê Kurdistanê, êdî aktorekî pêşeroja Sûriyê ye. Eger pêşbînî û şirove rast derkevin, ew jî bo Tirkiyê derbeyek e. Jixwe Tirkiye bi vê kerb û tirsê tundrewan berdide Kurdan û hewl bide ku li maseyê cihê Kurdan tine be.

Eger PYD di platformeke navborî de cih bigire, divê ew cih ne li nik Baasê, an jî dijberên wê be. Kursiyê partiyeke kurd yê nûnertiya mafên neteweyî yên Kurdan e.

Divê yekparebûn û mayindetiya Sûriyê ne xema Kurdan be. Ji ber ku sînorên wê jî li ser perçiqandin û înkarkirina Kurdan hatine avakirin. Bi çi awayî be jî, rûxandina wan sînoran bûyereke şoreşgerî û dadwerî ye. Ne tenê Sûrî, lê Tirkiye, an jî Îran, kîjan di heriyê de biçike, di xêra Kurdan û mirovahiyê de ye. Lê PYD ji vê bûyerê çiqas haydar e? An jî rastiyê ji raya giştî vedişêre? Ji ber ku bi mehna "şerê li himberî PKKê" ji gellek dever û gundan Kurdan tên qewirandin. Bêyî şik û guman, ev bi plangerî dibe û li pişt wê nîjadperestiya ereb û dewleta tirk heye, ew dixwazin rê li ber daxwazên pêşerojê bigirin û herwiha jîngeha Kurdan teng dikin.

Eger PYD bixwaze bi şanazî di platformên navneteweyî de cih bigire, divê li himberî partî û komên kurd di helwesteke hembêzkirinê de be. Ji ber ku heya vêga mînak xweşbîniyê nade mirov. Bûyerên revandin, kuştin, girtin û qedexekirina raman û çalakiyên cuda, PYDê fikaredar dike. Divê PYD baş bizanibe ku di qada navneteweyî de bi berjewendiyên partîtiyê tevgerîn û berpirsyariya neteweyî ji hevûdin gellekî cuda ne. Hêvî ev e ku ji ber hingofiyên zarokane keyseke zêrîn ji dest neçe.

Sererastkirin

Di nivîsa hefteya borî de, ya bi sernavê "lehengên zirtan", di cihê Hakan Fîdan de Hikmet Fîdan hatiye nivîsandin. Ji ber vê şaşiyê lêborîna xwe ji xwendevanan dixwazim."

Kêşeya Goran ligel desthilata PDKê

Wladimir van Wilgenburg

Tevgera Goran di encama hilbijartinên îsal de hejmareke baş a kursiyên parlementoya Kurdistanê bir. Lawaziya YNK, weke encameke ne amadebûna Talebanî, hevkariya Goran kir ku dengên zêdetir bidest bixe. Lê kêşeya Goran bi berdewamî ew yek dibe ku PDK hey bihêz dimîne. Tenê dubendiyeke navxweyî di hundirê PDKê de derfetê ji Goran re peyda dike ku bihêz derkeve.

Di hilbijartinên sala 2009 de Goran 25 kursî anîn. PDK û YNK jî li şûna 75 kursiyan, 59 kursî bi dest xistin. Rapirsî û encamên destpêkê nîşan didin ku PDK pirraniya dengan bidest dixe û hikûmetê pêk tîne, Goran jî careke din zora YNKê dibe.

Silêmanî tenê ji sedî 43ê dengderan lê hene, Hewlêr û Dihok jî ji sedî 57ê dengderan li xwe digirin. Ev nîşan dide ku Goran dikare zora YNK bibe û cihê wê bigire, weke duyem partiya xurt di siyaseta Kurdistanê de. Lê partiyên îslamî nikarin bibin hêzeke karîger.

> **Stratejiya eşîrger a PDKê wiha dike ku kêşeya nakokiya li ser serkirdayetiyê di nava PDKê de kêmtir be.**

Tew eger Talebanî jî bimire, Goran nikare wiha bike ku dengder li Dihok û Hewlêrê pişta xwe bidin PDKê.

Yek ji kêşeyên mezin ên Goran ew e ku pirraniya dengderên kurd ji bo karên xwe pişta xwe bi hikûmetê girêdidin (yanî bi PDK û YNK), lewma jî her çiqasî gellek kes ne dilxweş in bi pirsên weke gendelî, giranî û tendirustiya xerab, lê deng nadin Goran.

Goran dikare di hilbijartinên civata parêzgehan de jî, ku di Mijdara bê de tên kirin, zora YNKê bibe. Lê dijwar e ku zora PDKê bibe. Herwiha zehmet e Goran û Îslamî bikarin 56 kursiyan li parlementoya Kurdistanê bi dest bixin.

Lewma tenê eger hat û Goran bû hevpeymanê YNKê û partiyên opozisyonê jî di siberojê de li dijî PDK bin, wê demê ev yek dikare rû bide. Lê ev yek jî pirr dijwar e. Me dît jî ku Goran di Sibata 2011ê de nikarîbû serdestiya PDKê li Hewlêr û Dihokê lawaz bike.

Lewma tekane şens ji bo Goran ew e ku nakokî di nava PDKê de dirust bibin. Serokê Yekgirtû Selahedîn Behadîn di sala 2010ê de ji berpirsên Amerîkayê re gotibû ku PDK wê di navbera Mesrûr Barzanî û Nêçîrvan Barzanî de parçe bibe û kêşe jî li ser desthilatê ye.

Lê herkes dizane ku stratejiya eşîrger a PDKê wiha dike ku kêşeya nakokiya li ser serkirdayetiyê di nava PDKê de kêmtir be, weke ku di YNKê de heye. Eger wiha hat û Mesûd Barzanî mir, PDK qir nabe.

Balyozê Amerîkayê Christopher Robert Hill di sala 2010ê de têbînî kiribû ku heta ku Mesûd Barzanî saxlem be, di nava PDKê de nakokî beloq nabin. Lewma Goran divê bendewar be, yan jî divê ji nişkê ve guherîneke radîkal li Kurdistanê rû bide.

www.arsivakurd.org

Ji bazara Kurdistanê razî ne

100 şirketên amerîkî li Herêma Kurdistanê kar dikin



Arî Resûl *Hewlêr*

Endamekî damezirênerê Encûmena Bazirganî ya Amerîka-Kurdistan ragihand ku niha nêzîkî sed şirketên amerîkî li Herêma Kurdistanê kar dikin û diyar kir ku şirketên amerîkî ji bazara Kurdistanê razî ne.

Encûmena Bazirganî ya Amerîka-Kurdistan, yekîtiyeke bazirganî ye. Baregeha wê ya sereke jî li Washingtonê ye. Ev encûmen ji bo pêşkêşkirina hêsankariya bazirganî û aborî ya şirketên amerîkî da ku bên li herêma Kurdistanê kar bikin dixebite.

Encûmen ji aliyê çend şirketên di warê cûrbicûr yên beşê pîşesaziya mezin û navdar ê Amerîkayê di Mijdara 2012ê de hate damezirandin. Armanca sereke ya vê encûmenê berfirehkirina bazirganiya di navbera şirketên amerîkî ligel Herêma Kurdistanê ye. Pêre jî xurtkirina pêwendiyên di navbera beşê taybet ê herdu aliyan de.

Ew wek rêxistineke qezencnexwaz kar dikin û ji aliyê hikûmeta Herêma Kurdistanê ve piştgiriya wan dibe. Eyal Frank yek ji damezrênerên encûmena bazirganî ya Amerîka-Kurdistan ragihand ku ew piştgiriya darayî ji hikûmeta Herêma Kurdistanê wernagirin: “Berpirsên bilind ên hikûmeta Herêma Kurdistanê bi amadebûna xwe di helkeftên me de piştgiriya me dikin. Jêdera me ya darayî kompanyayên endamên me ne. Ew bi salan pereyan didine rêxistinên me."

Eyal Frank çend caran ji bo ku derbarê Herêma Kurdistanê de bibe xwedî bêhtir agahdarî, serdana Kurdistanê kiriye. Wî herwiha nûneriya şirketên amerîkî kiriye û van çavdêriyên xwe tîne zimên: "Herêma Kurdistanê xwedî yek ji herî pêşketîtirîn yasayên hilbirînê ye. Derfeta mezin a hilbirîn û bazirganiyê tê de heye. Li nav Rojhilata Navîn hin bi hin bazara Kurdistanê derdikeve. Ji aliyê asayişî ve aramî ye. Herwiha dosta welatên rojavayî û Amerîka ye. Bi ser de jî bi jêderên xwe yên siruştî yên wekî petrol û gazê dewlemend e."

Ev encûmen ji nêzîk ve ligel hikûmeta Amerîka û hikûmeta Herêma Kurdistanê kar dike. Frank dibêje ku kesên pilebilind ên hikûmeta Herêma Kurdistanê beşdarî civînên wan dibin.

Encûmena Bazirganî ya Amerîka-Kurdistan şirketên amerîkî teşwîkî karkirina li Kurdistanê dike. Her şirketa bixwaze bibe endam pêwîst e hersal 30 hezar dolar bide. Herwiha endamên hevbeş 10 hezar dolar didin. Frank diyar dike ku heta niha 20 endamên vê encûmenê hene: “Ji bilî şirketên amerîkî, şirketên kurdî jî dikarin bibin endam. Banka Navdewletî ya Kurdistanê endama encûmena me ye."

Şirketên wekî Sonoro Energy, Marason Energy, Hîlud International Energy, Hîs Kooperation Krêst Investment hinek ji endamên diyar ên encûmenê ne.

Encûmen derfetê dide şandeyên bazirganî ji bo ku serdana Herêma Kurdistanê bikin û pêre jî şêwrê pêşkêşî şirketan dike. Frank dibêje: “Em şirketên amerîkî teşwîk dikin ji bo ku werin Herêma Kurdistanê."

Li gor agahdariyên Frank dide, ev şirket ne tenê yên enerjiyê ne: “Şirketên xizmetguzariyê, şaxên hotêlan, şirketên teknolojiyê, şirketên çandiniyê û şirketên ewlehiyê yên amerîkî jî li Kurdistanê kar dikin."

Ceneral James Jones rêveberê cihbicihkar ê encûmenê ye. Berê jî şêwirmendê encûmena asayişî ya Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bû. Herwiha serokê Espêkît Holdînga ku di warê berhemanîna enerjiyê de dixebite û niha li Herêma Kurdistanê kar dike.

Heta niha hejmareke ji şirketên herî mezin yên wekî Exxon Mobil û Chevron li Kurdistanê kar dikin. Herwiha hejmareke ji şirketên hilbirînê yên amerîkî bi alîkariya vê encûmenê niha li Herêma Kurdistanê ne, ji bo ku di warên cûrbicûr de kar bikin.

Frank dibêje ku heta niha wî nebihîstiye ku ti şirketên amerîkî li ser hatina xwe ya Herêma Kurdistanê poşman bûne: “Şirketên amerîkî ji bazarên Kurdistanê razî ne, ji ber Herêma Kurdistanê dosta rojava û Amerîkayê ye. Derfetên aborî yên gellekî baş tê de hene." Li gor gotina navborî Eyal Frank, niha nêzîkî 100 şirketên amerîkî li Herêma Kurdistanê kar dikin.

Nasname winda bûne

Herdu nasnameyên jêrê winda bûne û xwediyên wan tika dikin ku ew ji navenda Rûdawê ya li Kolnê re werin şandin, eger ji aliyê kesekî ve hatibin dîtin:

1. **Karwan Hussein Abdullah**
Jidayikbûn: 01.06.1989 - Shekhan
Hejmara nasnameyê: 2312876, core: G
Derketin: 03.09.2008
Dawîbûn: 02.09.2016

2. **Mohamad Hama Salh Mostafa**
Jidayikbûn: 02.04.1987 - Sulaimanya
Hejmara nasnameyê: Nîne, core: G
Derketin: 20.5.2006
Dawîbûn: 20.5.2015

Hausarzt M.D. (Rus.)
Serdar Mustafa
Facharzt für Allgemeinmedizin

Sprechzeiten:

Mo	Di	Mi	Do	Fr	Sa
8-12	8-12	8-12	8-12	8-12	8-12
15-18	15-18		15-18	15-18	

Krimstraße 2. 44145 Dortmund
Tel. 0231 / 81 85 47 • Fax 81 80 74
Mobil 0171 / 27 00 550

Mezopotamya
Weqfa Şandina Cenazeyan
Mezopotamya canazeyên we dişîne herçar beşên Kurdistanê
Di rojên dijwar de em bi we re ne
Tel.: 02331 - 47 33 886
Mobil:
0178 - 18 56 970
0172 - 27 24 163

Navnîşan: Frankstr. 6 • 58135 Hagen/Almanya
E-Mail: sigortaci-alp@hotmail.de
www.mezopotamya-cenazefonu.com
Reklam

Reklam
BERTAX - CONSULTANT
Unternehmensberatungsgesellschaft mbH

Mihasebeya we di destên ewle de!
Mihesebeya Malî
Finanzbuchhaltung
Mihesebeya Karkeran
Lohnbuchhaltung

Office-Essen
Zeche Katharina 2
45307 Essen
Tel.: 0201/8933950
Fax: 0201/8933951
Mobil: 0177/3147213
E-Mail: info@bertax-consultant.de

Office-Dortmund
Geschwister-Scholl-Str. 26
44135 Dortmund
Tel.: 0231/15044-510
Fax: 0231/15044-115

Kamîran Darouich
Zahnarzt
Seestr. 43
13353 Berlin
Tel.: 030 - 453 80 96
Fax: 030 - 817 02 297
Öffnungszeiten
Mo. - Di. - Do.: 09.00 - 18.00 Uhr
Mi. - Fr.: 09.00 - 15.00 Uhr
Sa.: Nachvereinbarung
Reklam

Keça Karapetê Xaço Araksî Xaçatûryan

Piştî mirina diya min diranên bavê min ketin!

Salihê Kevirbirî *Yêrevan*

Araksî Khacaturyan (Xaçatûryan) bi gotineke din Araksiya Karapetê Xaço, her wekî ji nav jî diyar dibe keça dengbêjê bi nav û deng Karapetê Xaço û Yevaya Hagopê Ezîz e. Ew bi salan e li gundê Solxoza Çaran a Eçmîadzîna Ermenistanê ligel mêrê xwe jiyana xwe berdewam dike.

Meta Araksiyê bi van hevokan behsa malbata zarokatiya xwe dike: “Sala 1946ê em ji Sûriyê hatin Ermenistanê. Dê û bavê min demen pêş bi ermenkî baş nizanibûn. Em hêj nû hatibûn. Paşê hêdî hêdî hînî Ermenkî jî bûn. Lê bavê min tim bi me re bi kurdî mijûl dibû. Herçî diya min bû, ji bilî kurdî carcaran bi Ermenkî jî bi me re mijûl dibû.”

Mezina malê Araksî, biçûka malê Xatûn

Araksî zaroka mezin a Karapetê Xaço ye. Sala 1942yê li Qamîşloya Rojavayê Kurdistanê ji diya xwe bûye. Sêropê birayê wê sala 1944ê li Beyrûda Lûbnanê çêdibe. Sala 1946ê ji Binxetê derdikevin û bi rêya Batûmê re xwe digihînin Ermenistanê. Hingê zarokekî şeş mehî bi navê Antranîk li ser milê dayîkê bûye. Lê Antranîk heman salê rehma Xwedê dike. Sala 1948ê xwuşka wê ya bi navê Anahît tê dinyayê. Anahît 7ê Gulana 2010ê li Kîrovakanê xatir ji jiyanê dixwaze. Sala 1951ê xwuşkeke wê ya din çêdibe ku navê wê Sîranûş e. Ew jî li Sovêtaşêna (Nûbaraşên) Yêrevanê dimîne. Xwuşka biçûk jî Xatûn e ku sala 1955ê çêbûye û ew jî li gundê Solxoza Çaran a Açmiedzîna Ermenistanê dijî.

Bi dilekî geş behsa dê û bavê xwe dike: “Dê û bavê me ji me re gellekî baş bûn. Dê û bavê min di dema Sovyetê de li gund kar dikirin. Ji hikûmetê re kar dikirin. Kar û barê rezê tirî, bax û bexçan dikirin. Temamiya gundiyan li wir dişixulîn. Serê mehê pereyê xwe distandin. Em birçî nediman ha!”

Gava li ser sohbeta bavê xwe diaxive, wekî zarokan şa dibe û dibêje: “Gava hinek ji wî aliye Bakur dihatin bavê min, heta êvarê bi wan re mijûl dibû. Ne ew ji xeberdanên bavê min têr dibûn, ne jî bavê min ji xeberdanên wan.”

Pirsa min a bi rengê “li malê jî bavê te kilam digotin?” wiha dibersivîne: “Li malê jî digot. Li van deveran fincanek araq bêyî stran û kilamên bavê min di qirika kesî re derbas nedibû. Çi Ermenî çi Kurd, daweta ti kesî bêyî bavê min nedibû. Zêdetir jî Kurdan gazî dikirin. Lê bavê min bi ermenkî stran nedigotin, nizanibû bi ermenkî bibêje.”

Rehmetiya diya wê sala 1976ê rehma Xwedê dike. Ew jî dizane ku eşqa dengbêjan zehf e. Jê re dibêjim ku gellek dengbêj hene 2-3 jin anîne. Gelo piştî mirina jina xwe, Apê Karapêt qet fikiriye ku jin bîne? Meta Araksiyayê: “Qet nefikirî tiştekî wisa bike!” dibêje û berdewam dike: “Bavê min ji diya min zehf hez dikir. Sala 76êç gava diya min mir, salek paşê jinek hebû jî xelkê me. Ji bavê min re got; xalo were em herin Ûcanê ji te re jinekê bînin.” Bavê min ji wê pîrekê xeyidî. Heta ew pîrek mir jî bavê min pê re xeber neda. Neçû ser qebra wê pîrekê. Got; “naxwe piştî malxwêya xwe, ezê çawa herim jineke din bînim. Bi ti awayî ez ji Seropê kurê xwe re şirîkekê çênakim.”

Li ser qebrê bi diya min re diaxivî!

Gelo dema diya wê Yevaya Hagopê Ezîz rehmet dike, bavê wê çi kiriye? Rehmetiyê bav dikeve nava rûhiyeteke çawa? Bi kesereke kûr û çavên melûl wiha dibersivîne: “Gava diya min nexweş bû, bavê min herdem li kêleka wê rûniştibû. Bi gav û seet li ber serê wê bû. Lê piştî ku diya min rehma Xwedê kir, bavê min nikaribû bihata cihê ku diya min lê rûdinişt. Xwe diavêt vî alî û wî alî, tebata wî nedibû. Bavê min heta wextekî dirêj jî wekî dîn û haran lê hatibû. Ji bîr nedikir.

Gelo carcaran diçû ser qebra xanima xwe? “Her dem diçû” dibêje û berdewam dike: “Her roj dihate mala me. Lê heta ku neçûya ser qebra diya min, nedihat cem me. Tim digot; “Lawo diya te diranên min jî bi xwe re birin! Heta diya min sax bû, hemû diranên wî temam û kamil bûn. Tenê ji ber ku jî hespê ketibû, diranekî wî şikestibû. Hemû diranên bavê min saxlem bûn. Piştî mirina diya min, hemû diranên wî ketin.”

Ew diyar dike ku bavê wê li ser qebrê her dem ji diya wê re digot “Te çi kir? Te ez li vê dere bê xwedî û xwedan hiştim.” Li gorî gotina wê, bavê wî gellek kilam avêtibû ser diya wê: “Diya min ji kilama ‘dayîkê’ zehf hez dikir. Ez bi xwe ji hemû kilamên bavê xwe hez dikim.”

Gelo rojekê difikire ku here gundê Bileydera Batmanê, ku bavê wê li wir çêbûye: “Ez çima nexwazim, zehf dixwazim. Lê gava ez herim divê destvala jî neçim. Divê di deste mirov de hebe ku mirov here. Gava tine be, tu herî nabe. Vê gavê hûn dibêjin were em herin. Eger ez bêm mala te, destvala werim dibe? Nabe… “

Civat û sohbeta Karapetê Xaço çawa bû? Piştî ji Binxeta Sûriyê derket, çima neçû Frensayê, lê hate Ermenistanê? Li ser vê yeke dibêje ku bavê wê bi xwe nexwestiye ku here Frensayê: “Berpirsen frensî jê re çend caran got were em te bibin Frensayê, neçe Ermenistanê. Şer e, şer hêj xelas bûye. Ermenistan zehf teng e, ji we re nabe!” Bavê min got “na weleh ezê herim, ez li vê dere namînim, nayêm Frensayê jî.” Çend sal paşê tê bîra min. Salên 50yan bû. Camêrek ji Fransayê hatibû. Ji ber ku bavê min qelûn dikişand, yekî bi wî zilamî re qelûnek şandibû. Navê wî Berces bû. Ew qûmandarê bavê min bûye di leşkeriyê de. Gotibû ku te Karapet dît, silavên min lê bike.” Bavê xeber bi wî zilamî re şand û got “ez li Sûriyê çawa bim, here jê re bibêje Karapet li Ermenistanê deh car çêtir e.”

Li ser pirsa “Kurdên me, çi Misilman, çi Êzdî, dihatin serdana Apê Karapêt?” wiha dibêje: “Erê Xwedê ji te razî! Weleh zehf dihatin. Zehf jê hez dikirin. Gava bavê min mir, qiyamet rabû! Mîna roja heşrê bû. Hêj cenazê bavê min li erde bû, di nava gund de ji xelkê cih nemabû. Ermenî zehf hatibûn. Kurd zehftir hatibûn, ji Almanyayê hatibûn, ji Rûsyayê hatibûn. Ez gellekî bêriya bavê xwe dikim…”

Dixwazim hinek behsa rojên wî yên dawiyê bike. Mesela gava mirina hinek kesan nêzîk dibe, rewşa wan hinek diguhere, bi xwe dihesin ku wê bimirin. Gelo ev rewş li cem Apê Karapêt jî peyda bûye an na? “Zehf ecêb e, tiştekî cuda nedigot” dibêje û lê zede dike: “Beriya mirinê bi rojekî qîza xalê min hatibû ku derzî lê bide. Jê re got; “Guhar, lawo niha tu min derzî dikî, gelo tu dibêjî ezê baş bibim an ezê bimirim? Guhara qîzxala min got; “Wî xalo Xwedê neke, çima tu bimirî, tu spîsaxlem î.” Bavê min got; “Qîza min weleh ez ne baş im. Hew te dît ez bimirim.” Bi rastî jî li ser xwe bû. Tiştekî wî tine bû. Lê dotira rojê rehma Xwedê kir… Mehek bere ji welat hatibûn ba wî. Heta sibê ji wan re kilam gotin. Şaş û ecêb mabûn. Digotin ‘ev tu çawa dikarî hewqas bistirî?’, digot ‘ez nû lê germ bûme.’ Ew roj qet ji bîra min naçin…”

Wêne: Salihê Kevirbirî

Hevkarê me Salihê Kevirbirî, Araksî Xaçatûryan û neviyê Karapetê Xaço Karapêt



Ji arşîva Salihê Kevirbirî

Ji sala 1990î ve mirina zarokan nîvqet zêde bûye

Li gor îstatîstîkên Netewên Yekbûyî (NY) ji sala 1990ê ve mirinên zarokan yên ji ber nexweşiyên cure li seranserî dinyayê nîvqet bûye. Heta 1990ê hersal 12,6 milyon zarok li seranserî cîhanê dimirin. Ev hejmar par daket 6,6 milyonan. Li gor heman daneyan herroj 18 hezar zarokên temenê wan di bin 5 salî de ne dimirin. NY dixwaze bi xebatên xwe yên tenduristiyê heta sala 2015ê vê hejmarê hêjî kêmtir bike. Ji hêla din ve hate diyarkirin ku ji % 17ê mirinên zarokan ji ber îltihaba pişikê rû didin. Herwiha sedemê mirina % 10ê zarokan ji ber nebûna derfetên tedawiyê û zûçêbûnê ye. Bi heman şêweyî % 45ê zarokan ji ber kêmxwarinî û xezaniya dêbavan dimirin. Li hemû cîhanê nîvê mirinên zarokan li van pênc welatan pêk tên: Hindistan, Kongo, Nîjerya, Pakîstan û Çîn.



Bi vîrûsên sorikan êrişî timura penceşêrê dikin

Navenda Netewî ya Nexweşiyên Timurê (NCT) ya li bajarê Heidelberga Almanyayê di warê şerê li dijî penceşêrê de serkeftinek mezin bi dest xist. Zanyarên navendê vîrûsên sorikan veguhestin û berdan di nav hucreyên timura penceşêrê de. Pê re jî madeyên ku mekanîzmaya xweparastina laşê mirov baştir bikin di tevgerê de hatin bikaranîn û bi vê yekê re jî êrişên li ser hucreyên penceşêrê bi hêztir bûn. Ev metod heta niha di labaratuarê de bi awayekî serkeftî bi encam bûye. Zanyar dixwazin di demên pêş de vê metoda nû ya li dijî penceşêrê li ser mirovan jî biceribînin.

Rêveberê tîma vê xebatê Dr. Guy Ungerechts diyar kir ku ji bo ku ew bigihêjin encameke bi bandor, wan guherînin genetîk li ser vîrûsa sorikan pêk anîn. Ungerechts herwiha derbarê pêkanîna vê metodê jî wiha axivî: "Em ê vê metodê li ser nexweşên penceşêrê yên ku nexweşiya wan giran bûye biceribînin. Bi vî awayî em ê bibînin ka ev metod çiqasî bikêr e û çi bandora erênî dike. Rêveberê tîmê herwiha da zanîn ku ev gav bi serketî be, wê bibe dora bikaranîna vê metodê ya li ser nexweşên timura penceşêrê.

Gêzer ji bo çêbûna xwînê gellekî baş e

Gêzer bi tehma xwe ya şêrîn hem ji hêla bebekên ber şîr û hem jî mezinan ve têne hezkirin. Gellek dayik gêzerên hêrandî didin zarokên xwe yên nû ji şîr vebûyî. Herwiha li Ewropayê piştî bacanên sor, herî gellek gêzer têne çandin. Ev jî destnîşana wê yekê ye ka mirov çiqasî ji xwarina gêzeran hez dikin. Lê belê gêzer ne tenê bi tehma xwe xweş in. Ew herwiha ji hêla tendûristiyê ve jî gellekî bi fêde ne. Gêzer bi maddeya betacarotin ku piştre vediguheze vîtamîn A navdar e. Bi vê maddeya di nava gêzerê de pêşiya belavbûna jehra bi rêya tîrêjên rojê ya li ser çermê mirov tê girtin. Herwiha ew bandorê li jehra ku ji ber dûyê cixarê li ser mîdê bi cih jî dibe bandoreke erênî dike. Di nava gêzerê de gellek maddeya hêsin a ku ji bo pêkhatina xwînê girîng e heye. Ev yek bi taybetî bandoreke erênî li çêbûn û pêkhateya xwîna bebekan dike. Maddeyên mîna kalsiyom, kalium û vîtamînên C û K jî di nav de hene. Aliyekê wê yê din yê sûdwer jî ew e ku qelewiyê çênake; Di nava 100 gramên gêzerê de tenê 25 kalorî hene.

Xaçepirs

Çeperast: 1- Huner, marîfet – Rûxandina berfê, herikîna berfê – Parçe, beş. **2-** Lêkirin, sazkirin – Xwezayî, tabiî. **3-** Kesên ji modeyê fahm dikin – Zilamên pîr û yextîyar. **4-** Lêxistin, şûna lêdanê (berepaş) - Pêşkêşvanê/na bernameya televizyonê. **5-** Nexweşîyek stresî û ruhî, ji xur û pizikên çerm çêdibe. **6-** Xeta ku bi rengê zer çêbûye – Reh, damar, kok. **7-** Kesê ku kîmya xwendiye, pisporê kîmyayê. **8-** Ji bo çi, sebeb – Seyran, parsekî, ger. **9-** Çirandin, jihevdexistin, qetandin. **10-** Tîpên zimanê Rûsî û Slavî – Hozar, helbestvan (berepaş).

Serejêr: 1- Malwêranî, talanî, derbederî – Di trafîkê de nîşana Danîmarkayê. **2-** Porê gij û tevlihev – Ne xav û ne keliyayî, nîv keliyayî yan nîv qelandî. **3-** Teslîmkirî, hêsîrkirî, dan. **4-** Di wateya "haydê, de werin" de tê bikaranîn (berepaş) – Navekî jinan (berepaş). **5-** Ne tirş û ne şîrîn, guvaştin – Tiştên li ezmanan, bi ezman ve girêdayî. **6-** Yekîtî, yekdestî, yekparçeyî (berepaş). **7-** Di devoka Behdînan de pêvek û zêdekirina hevok yan gotinan – Li Endonezya navekî zilaman (berepaş). **8-** Dengê mîh û berxikan – Bêhnpêketî, kufikî. **9-** Fedîko, şermezar (berepaş). **10-** Li erdê hişt, bi xwe re nebir (berepaş) – Ordî, leşkir, hêza leşkirî. **11-** Kesên ku bi çinîna zad debara xwe dikin, emele. **12-** Şil, nerm, ne hişk û ziwa. **13-** Çûreyekî pilingan. **14-** Bitrî, nebirçîtî, halxweşî (berepaş). **15-** Li Îtalya navekî zilama. **16-** Bi zimanê Erebî "na" (berepaş).

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14	15	16
1								■				■				
2									■							
3								■								■
4					■		■									
5		■		■						■						
6								■								
7		■														
8	■					■										
9									■							
10						■										

Bersivên hejmara 216

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14	15	16
1	D	A	D	W	E	R	Î	■	B	E	R	A	D	A	Y	Î
2	A	W	A	■	T	E	■	T	E	L	E	F	O	N	■	C
3	D	I	R	A	N	■	A	S	R	Î	N	■	H	■	D	A
4	G	R	E	K	Î	S	T	A	N	■	G	U	N	D	O	R
5	E	■	S	Î	S	I	K	■	A	K						
6	H	Ê	■	R	Î	M	E	L	■	R						
7	■	M	R	E	T	■	Y	A	R	Î						
8	A	L	A	M	E	T	■	Z	A	T						
9	R	I	Z	A	■	A	M	E	D	Î						
10	E	D	Î	■	Î	T	Î	R	E	K						

www.arsivakurd.org

Rojbûn an jî şahiya te ye û tu jî dixwazî wêneyê xwe li vir bibînî? Naxwe ji me re bişîne vê navnîşanê: info@rudaw.eu



Hîdayet

Hîdayet 8 salî ye û diçe dibistana seretayî. Dê û bavê Hîdayet kurdên Anatoliya Navîn in. Bi malbatî li Almanyayê li bajarê Troisdorfê dimînin. Du xwişkên Hîdayet hene û herdem ew bi wan re bi zimanê kurdî û almanî dipeyive. Ew gellek hez ji dibistanê dike û dixwaze bibe polîs. Hîdayet hersal bi malbata xwe re diçe gund. Bapîr û dapîra wî li gund dijîn. Gava Hîdayet û herdu xwişkên wî diçin gund, bapîr û dapîra wan pirr kêfxweş dibin. Hîdayet ji lîstikên kompîtûrê gellek hez dike.

Di navbera herdu wêneyan de 6 cûdahî hene, fermo wan bibînin?

Hirç dixwaze here nepoxa (balon) xwe bîne, hûn dikarin alîkariya wî bikin?



Pêkenok

Rojek ji rojan Ronahî li ber deriyê malê sekiniye û digirî. Jinek wî dibîne û jê dipirse: Kurê min tu ji bo çi digirî?

Ronahî dibersivîne: Diya min pisîkên min ên biçûk avêtin derve.

Jinik: Wisa xuyaye tu gellekî li ber wan dikevî? Lê ew dikarin li derve jî bijîn.

Ronahî: Na na, ji bo wê yekê nagirîm. Min dixwest ez wan bavêjim derve.

www.arsivakurd.org